# RÊZIMANA KURDÎ

## AMADEYÎ

## 2

*Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Ziman û Perwerdê ya KCK'ê û Komisyona taybet ya ziman û perwerdê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.*

# AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

## Komisyona Ziman ya berê pirtûk amade kirîn

M. Şîrîn çetin, Mazlum tekîn

Ji aliyê komîteya ziman û perwerdeya kck'ê ve komîsyonek taybet ji bo nûkirin û sererastkirina van pirtûkan hatiye damezrandin:

## Komîsyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan

Mazlum Tekîn, Mizgîn Egîd, M. Şîrîn Çetîn, Dijwar Botan, Kewzer Kaçan

## Komisyona venêrîna pirtûkê

Mazlûm Tekîn, Mizgîn Egîd, Dijwar Botan, Sedîq Benek

## Mîzanpaj, rûpelsazî, sererastkirin û berhevkirina wêneyan


Bedredîn OY

*Çapa pêşîn: 1999*
*Çapa nû: 2013*

**Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

**Email: s.m.kurdi2014@gmail.com**





*"Zimanê me bingehê netewa me pêktîne, divê em biparêzin û pêş bêxin."*

## NAVEROK

**BEŞA 1. ........................................................................................9**

ZIMAN Û CIVAKBÛYÎN ........................................................................9
ZIMAN Û MIROV........................................................................10
DÎROKA ZIMANÊ KURDÎ ........................................................................13
CIHÊ ZIMANÊ KURDÎ DI NAV ZIMANÊN CÎHANÊ DE Û DEVERÊN LÊ TÊN AXAFTIN ........................................................................17
TÊKILIYÊ ZIMANAN ........................................................................19
A-Dabeşkirina li gor çêbûnê: ........................................................................19
*B-Dabeşkirina Dîrokî (Ziman Li Gor Çavkaniyan)........................................21*
B- CIHÊ ZIMANÊ KURDÎ LÊ TÊ AXAFTIN ........................................................22
ZIMANÊ AXAFTINÊ, ZIMANÊ NIVÎSÎNÊ Û BERÊN WÊ YÊN CÛRBECÛR ................23

**BEŞA 2. ........................................................................................27**

PEYVÊN NAVDÊRÎ........................................................................27
*1-Nav ........................................................................28*
A-NAV, LI GOR TAYBETMENDIYÊN HEYÎNAN DIBE DU BEŞ: ................................28
B-NAV, LI GOR WATEYA XWE DIBE DU BEŞ........................................................30
C-NAV LI GOR JIMARA XWE DIBE DU BEŞ........................................................30
D-NAV LI GOR ZAYENDA XWE DIBE DU BEŞ:........................................................32
REWŞA NAVAN ........................................................................35
*1-Rewşa Nav Ya Xwerû........................................................................36*
*2- Rewşa Nav Ya Herikandî ........................................................................36*
*3- Rewşa Navan Ya Daçekî........................................................................38*
NAV LI GOR ÇÊBÛNA XWE ........................................................................42
CÛRÊN NAVÊN DARIŞTÎ........................................................................44
3- NAVÊN HEVGIRTÎ ........................................................................45
HEVALNAV........................................................................48
A-HEVALNAV LI GOR AWAYÊ BIKARANÎNA XWE........................................51
*1-Hevalnavên Çawaniyê ........................................................................51*
*2- Hevalnavên Diyarkirinê ........................................................................52*
Hevalnavên jimarî.....................................................................54
B-HEVALNAV LI GOR ÇÊBÛNÊ........................................................................57
SALOX........................................................................63

CÎNAV ..... 67
A-DI NAV HEVOKÊ DE ERKÊ CÎNAVAN ..... 68
B-CÛRÊ CÎNAVAN ..... 70
CÛRÊN CÎNAVÊN KESÎ ..... 70
TAYBETMENDIYÊN CÎNAVÊN KESÎ ..... 72
4-HEVALKAR ..... 77

**BEŞA 3. ..... 87**

PEYVÊN ALAVÎ ..... 87
ALAV ..... 87
CÛRÊN ALAVAN ..... 88
1-ALAVÊN BANGÎ ..... 89
2- ALAVÊN GIHANEK ..... 89
4-ALAVÊN SEDEMÎ ..... 92
5-ALAVÊN DAÇEKÎ ..... 93

**BEŞA 4. ..... 98**

DEM ..... 98
*1- Dema niha ..... 98*
*2-Dema bê ..... 100*
*3- Dema borî ..... 101*
*Di Hevokên Navdêrî de Dem ..... 105*
DESTÛRÊN NIVÎSÎN Û HÊMADANÎNÊ ..... 107

**BEŞA 5. ..... 107**

*A-Destûrên Nivîsînê ..... 107*

# BEŞA 1.



## ZIMAN Û CIVAKBÛYÎN





Zimanê destpêke xwe dispêre hêmanên jest û mîmîk, hîn jî ji hatina asta dengan pir dûr in. Her ku jiyana civakî pêşdikeve, ziman jî pêşdikeve, her ku ziman pêşdikeve, jiyana civakî jî pêşdikeve. Asta pêşketinê ya ziman, asta pêşketibûna jiyanê ye. Civakekî zimanê xwe yê dayîkê çiqasî pêşde biribe, ew tê wê wateyê ku asta xwe ya jiyanê jî pêş de dibe.

Ziman daneheva civakî ya zihnî, exlaq, hîs û fikra estetîk e ku civakê bi destxistiye; ziman hebûna nasnameyî û zîhnî ya wate û hîsê ya serxwetbûyî ye, bûye xwedî raveya civakê. Civaka xwe gihandibe ziman, bûye xwediyê sedema bihêz ya jiyanê.



Ev di heman demê de, pêşketina dualîteya (dualî) civakî jî nîşan dide. Divê li vir yanî di avakirin û pêşketina civakê de rista dayîkê bê zanîn. Ango ziman çawa bi riya dayîkê pêşket? Dema ku em berê xwe didin rastiya dîroka avabûna jiyana civakî û pêşxistina civakê, em her dem dibînin ku jinê ango dayîkê ristek dîrokî lîstiye. Ango rista dayîka Xwedawend di çêbûna ziman de gelekî mezin e.

Civakek, çiqas zimanê dayîkê ji dest da be û ketibe dibin desthilatdariya zimanê din, ev jî dide diyarkirin ku ew qashatiye mêtin, qirkirin û bişaftin.

## ZIMAN Û MIROV



Ziman, hîm û taybetiyetek ya mirov û mirovbûnê ye û berhemê jiyanek hevkar, hevpar û jiyanek ya civakî ye; di nav têkiliyên hilberîn û danûstandinan de wekî navgîneke lihevkirin û ji hev fêmkirinê derketiye. Bi gotinek hêj giştîtir mirov dikare bibêje: Her tiştê ku di xwezayê de (xwezaya giyanî û daringî de) û di mejiyê mirov de hebe, li hember wateyekê bê, ziman e.

Lewra ji destpêka dema ku mirov ber bi mirovbûnê ve ango ber bi civakîbûnê ve dimeşe, hem di hêla giyanî û hem jî di hêla daringî de,



ji aliyekî ve li rastî pir bextreşî, bûyer, qewimîn, karesat, astengî, zor û zehmetiyên pir giran, dijwar û tişt û heyberên xwezayî yên cuda cuda tê; ji aliyekî ve jî di encama ked û serkeftina di têkoşîna li hemberî wan tiştan de, li rastî pir bextewarî, dilxweşî û şadiyan jî tê. Belê, baş-xirab her tiştê ku derdikeve pêşiya wan, destpêkê wêneyekî wê/î dikêşe û ji bo ku ji tişt û heyberên din cuda bike, wateyekê dide, ango nav lêdike û di cihekî mejiyê xwe de tomar dike. Li vir, em ji vê hêza watedayînê, ango nav lêkirinê re dibêjin ziman-hizir.




Lewra ziman û hizir du tiştên wisa bi hev ve girêdayî ne ku bi ti awayî mirov nikare wan bêyî hev bihizire û ji hev qût bike. Di heman demê de digel ked/hilberîn, çand û civakîbûnê jî di nav têkilî û girêdaneke weke goşt û hestî de ne. Yek bêyî ya din nabe. Bi hev re dimeşin, hev xwedî dikin û pêşdixînin. Ji xwe tiştên ku mirov dikin mirov jî ev pênç hêmanên bingehîn, ango ked / hilberîn, ziman, hizir, çand û civakîbûyîn in. Lê di nav van de (ziman) yek heye ku weke nasname û bîra civak, gel û neteweyan derdikeve pêş; van her çarên din, di xwe de dihewîne û ji nifşan derbazî nifşan, ji paşerojê derbazî pêşerojê dike. Li vir têkilî û taybetiya ziman ya bi dîrokî re jî derdikeve pêşiya me û gotina ku: “Kesî/ê yan jî gelê ku zimanê wî hebe, dîroka wî heye, kesî/ê yan jî gelê ku zimanê wî nebe, dîroka wî jî tine ye.” wateyê dibîne.

Pirsgirêka ziman çawa ku bi çalekiya kes ya afrêner ve girêdayî ye, her wisa bingehê diyarkirina hebûna wî ye jî. Dema zimanê kesan ji destê wan tê standin, ew dikevin, rewş û astek wisa ku ji lawiran

kêmtir û paşdetir. Lewra di lawiran de, gelek melekeyên (mêldarî) xwezayî ku di mirovan de nînin peyda dibin. Lawir, bi wan melekeyan jiyana xwe didomînin. Lê melekeyên wiha xwezayî di kes yan jî mirovan de nînin. Mirov wan kêmasiyên xwe yên xwezayî bi ziman tekûz dikin. Ji ber vê sedemê ziman hêmana pêkhatina kesî ye. Ev pêkhatin jî çalakiyeke ku bi afrêneriya ziman derdikeve holê. Ziman, bi hidam (hiş, aqil, şûur), zanyarî, vîn (îrade), têgihştin û bîrê (hafiza) ve girêdayî ye lê encax bi avakirina ahengiyek ya bi wan melekeyan re hêza xwe ya hilberêner nîşan dide. Bîr, binkêşa ziman e, vîn venêrînerê wê ye, hidam ber alîkarê wê ye û hiş jî ronahîkirina wê ye. Li cihê ku ev meleke nekevin nav ahenga ziman, ji navgîna şaş bikaranîna gotinê wêdetir naçe ti derê, di gotinên tên kirin de jî wateyek tevahî û hevgirtî dernakeve û binkêşek dengan derdikeve hole.

## DÎROKA ZIMANÊ KURDÎ



Gelek arkelok vê dîtinê parve dikin ku zimanê yekemîn yê Şoreşa Neolîtîkê ziman û çanda Kurdî ye ku li qontara Çiyayên Toros-Zagrosê destpêkiriye.

Bi demê re bingehê hemû zimanên ku koka wan Arî (Hîn-Ewrupî) pêkaniye. Tê hizrîn ku BZ 9000 salan û vir ve ne bi fîzîkî lê bi awayekî çandî li erdnîgariya Hîn-Ewrupayê belav bûye.




Derketina ji çaremîn serdema qeşayê, BZ 20000-15000 salan weke ziman û çanda Arî, li ser xaka Mezopotamya ya Jorîn ji aliyê civaka Kurd ve pêşxistiye.




Li gor lêkolînên di peresgeha

Xirabreşkê (Riha) de peşketî, BZ. 12000 sal, gelek berhemên binirx yên wê serdemê yên weke wêneyên lawiran, peyker û nivîsên hiyegrolîf li ser diwarên perestgehê hatî çêkirin, hatine dîtin. Ji bo vê jî mirov dikare bibêje, nivîsîna hiyegrolîf ji aliyê civaka Kurd ve pêşketiye.




Kurd, yekem car li ser dika dîrokê (Bi navkirina Sumeriyan) bi navê Hûriyan BZ 3000-2000 sal tên nasîn.



Pergala mûzîk û lîstikên Kurdan li Rojhelata Navîn, çanda herî gur û xwedî nirxên hunerî ye. Mirov çanda Kurdan herî zêde di mûzîk û govendên wan de dibîne.

Dîsa mirov bi heman awayî bi çavdêriya li sekna jinê, cil û berg lixwekirin û şêwazê wê de, bi nazikî û narîniya rabûn û rûnştina wê de dibîne. Çavkaniya esaleta nifşên Kurdan ji serdema seretayî digire.

Dema em li çîrok û folklora Kurdan dinêrin, dibînin zêdetir destanî ne. Bi giranî destanên lehengiyê tînin ziman. Em di Destana Gilgamêş, Semîramîs, Tufana Nebî Nûh, Mem û zîn, Memê Alan û Derwêşê Evdê de van rastiyan dibînin.


Di pêkhatina vê reseniyê de, xwezaya çiyayên asê yên Kurdıstanê, berxwedana gelê Kurd a li dijî dagirkeriya domdar û zalim, dîrokeke demdirêj bandor dike.



Di demên dawiyê de rastî gelek belgeyên ku bi zimanê Hûrî hatine nivîsîn tên dîtin. Belgeyên ku di bajarên Orkîş (Amûdê) û Hîtîtan de hatine peydakirin, di derbarê Hûriyan de agahiyên berfireh didin.

Tê gotin ku Hûrî, berdewama civakên ku BZ 6000 salan Çanda Neolotîk û Şoreşa Ziman gihandine sazîbûnê û çanda Tel Xelef avakirine.

Ji xwe beriya zayînê 3000 salan Sumeran navê Hûrî, yanî gelê çiyayî li Hûriyan kiribûn. Civaka Kurd, di serdemên cuda de, bi navên cuda yên wek Kurtî, Hûrî, Mîtanî, Gotî, Sobarî, Kasîtî, Naîrî û Med hatine binavkirin, heman çand û ziman domandine.



Di belgeyên Sumeran de jî tê vegotin ku dema dîrokê bi awayekî nivîskî destpêkiriye civakên binyad Kurd in, di dika dîrokê de ristek ya sereke lîstine.

Sumeran navê weke Kurtî, Hûrî, Gotî, Naîrî û hwd li Kurdan kirine.

Kurtî: Kur=cihê bilind, tî=yên xwemal.

Hûrî: Gelê welatên bilind.

Gotî: Gelên bi lawirên Ga xwedî dikin. Go=Xuda, gotin, Xudayê herî bilind.

Naîrî: Gelên robaran. Gelên di navbera her du çeman (Dîcle û Firat) de dijîn.

Li vir tê dîtin ku Hûrî, Gotî û Naîrî bi Sumeran re pir di nav hev de ne.

Koka zimanê Hûriyan Aryanî ye. Tê çespandin ku gelek gotinên ji koka vî zimanî derbazî zimanê Sumeran bûne. Bi taybetî navê dexil û danan, navê amûrên çandiniyê…

Navê keştiya çolê (deve) bi zimanê Semîtîk e. Gelek pêşgir û hêmanên mêtiyê yên di zimanê Sumeran de ji heman çandê hatine dîtin.

Lê anîna destanên Derwêşê Evdê jî çavkaniya xwe ji nivîsên li ser teblêtên Sumeran yên BZ 2000 sal digire.

Heman tişt li herêma Sîncar ji aliyê keçek nediyar ku wekî GÎRO tê bi navkirin ve jî li ser navê lehengekî gel tê gotin.

Di navbera helbesta Gîro û nivîsên li ser tablêtan yên BZ 2000 sal û destana Derwêşê Evdê de hevşibîneke bêhempa heye.

Di navbera ola Xwedewanda Înana-Îştar û stêrkê de hevşibîn heye. Bi taybetî destana Nûh û Gilgamêş jî dişibin hev. Ji hêla mîtolojiyê ve jî Hûriyan bandor li ser Sumeran kirine.

Bi kurtasî dîroka nivîskî destnîşan kiriye, ziman û çanda Kurdî bi yekemîn Şoreşa Ziman û cotkariyê re, li ser xaka Mezepotamiyayê ango li ser xaka Kurdistanê weke nasnameyeke cihê awa girtiye û gihîştiye sazîbûnê.

Piştî vê pêvajoyê di destpêka şaristaniyê de li cih û demên cuda de, di bin navên cuda de wekê Hûrî, Gotî, Kasît, Mîtanî, Narî, Medî û hwd. Jiyana xwe domandiye.

Her wiha civaka Kurd, bandorek sereke li civakên derdora xwe kirine. Di dîroka Heredot de, pir zelal e ku ziman û çanda Medî bandora xwe li Helenan kirine û çavkaniya wan Medî ne. Helenî, BZ 900-400 pir zêde di bin bandora Medan de mane.





## CIHÊ ZIMANÊ KURDÎ DI NAV ZIMANÊN CÎHANÊ DE Û DEVERÊN LÊ TÊN AXAFTIN

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**Zimanê me yê em pê daxivin li derdora me jî bi milyonan pê daxivin . Ji milyonan mirovan re bi heman zimanî hestekî çawa tê afirandin? Hûn dizanin ji derveyî welat jî bi zimanê Kurdî tê axaftin. Gelo zimanê Kurdî, ji aliyê çend milyon mirov ve tê axaftin?**

## DAXUYANÎ




Zimanê Kurdî zimanek kevin yê cîhanê ye. Li gor kevinbûna xwe di aliyê nirxên dîrokî û wêjeyî de jî cihekî bi rûmet digre. Bingehê zimanê Kurdî B.Z bi hezaran sal despêdike, heya palvedide Şoreşa Neolotîk. Li hemberî êrişên dagirkeran yên dijwar hebûna xwe parastine. Ji ber ku di her derfetê de dagirkeran ji bo tinekirina ziman, çand û dîroka gelê Kurd xebitîne. Gelek nirxên wêjeyî yan tinekirine yan wekî berhemê xwe bi gel dane naskirin û pejirandin. Lê disa nekarîne ziman, çand, wêje û dîroka Kurdan ji holê rakin.

Gelek ziman di cîhanê de hene ku nikarin bi niviskî xwe pêşbêxin, tenê bi axaftinê xwe didin jiyankirin. Lê zimanê Kurdî bi çend şêweyên nivisînê dikare weşanê bike. Çand û wêjeya xwe pêşbixe.

Li gor awên (tîp) û dîrokê, zimanên cîhanê bi du awayan têne dabeşkirin.

**1-Dabeşkirina li gor çêbûnê**
**2-Dabeşkirina Dîrokî (ziman li gor çavkaniyan)**





## TÊKILIYÊ ZIMANAN

### A-Dabeşkirina li gor çêbûnê:

Ji aliyê çêbûna xwe ve jî ziman dikarin nêzîkî hev bibin. Zimanê ji heman şêweyan çêbûyî, di heman komê de tên jimartin, li gor çêbûna xwe dibin sê beş:

**Zimanê Yek Kite**

**Zimanê Bi Hev Ve Girêdayî**

**Zimanê Tewandî**

## 1- ZIMANÊ YEK KITE

Zimanên ku hemû peyvên wan ji yek kiteyê pêktên, jê re **zimanê yek kite** tê gotin. Ji ber ku qirika mirov di derxistina kiteyan de, li gor destûrên vî zimanî bi tixûbe, di rêbaza derxistina deng û balkişandinê de rewşên cuda cuda dafirînin. Ev bi têgehên cûrbecûr pir ji hev cuda, hevdu temam dikin.

**Mînak :**

Beşê zimanê Çîn û Tîbet zimanên yek kite ne.

## 2- ZIMANÊ BI HEV VE GIRÊDAYÎ

Ew zimanên ku koka wan dişkên û xirab dibin ji bo têgeh û rewşên nû koka peyvan tê guhertin û dikarin awênên nû bi xwe re çêbikin re **zimanê bi hev ve girêdayî** tê gotin.

**Mînak:**

Koka kitêp

Kîtap - katip - mektup - mektep

Pirtûk-nivîskar-name - dibistan

Mînakên li jor ji yek jêderê ne.

Rewşên cuda yên ji kokekê derketine, di destpêka peyvê de, li nav wê û li dawiya wê hindek deng tên zêdekirin û di aliyê çêbûnê de tên guhartin.

## 3-ZIMANÊ TEWANDÎ

Zimanên koka wan xweristî, ji bo têgeh û rewşên nû bi alîkariya zêdekirina hinek pêvekan pêktê re **zimanê tewandî** tê gotin.

**Mînak:**

Zimanê Kurdî ji bo vê rewşê dest daye.

Cot+ yar + î = cotyarî

Zimanê Kurdî hem li pêşiya peyvê hem jî bi dawiya peyvê ve pêvekan digirin.

Pêvekên bi peyvan ve tên zeliqandin, di koka peyvê de guhertinê çênakin.

**Mînak:**


"Sibehê zû darî ji gund derdiketin û diçûn daran, heya nîvro dizivirîn malê û darên xwe difirotin û bi vî awayî xwe didan jiyankirin."

Dema em temaşeyî peyva "darî " dikin, dibînin ku pêveka "î" li ser peyva "dar" hatiye zêdekirin û peyvek nû daye afirandin lê di kokê de guhertin çênekiriye.

## B-Dabeşkirina Dîrokî (Ziman Li Gor Çavkaniyan)

Nêzîkatiyên zimanan yên di aliyê bingeh de tê wateya nêzîkatiya mirovên wan.

Zimanên ji heman kokê pêkhatîn û bingehekî hevbeş pêkanîn re dibêjin malbata ziman. Di cîhanê de, gelek malbatên zimanan hene lê yên ku pir tên naskirin û xebat li ser tên kirin, wiha ne;



Kurdî Îranî Belûcî Hindî Elmanî Îtalî Îspanyolî Fransî

**TÊBÎNÎ:**

Dema em zimanê Kurdî, di nav van herdu dabeşkirinên zimanê cîhanê de digirin dest; taybetmendiyên herdu biran digihin hevdu û em dikarin zimanê Kurdî bi vî awayî bidin diyarkirin.

## B- CIHÊ ZIMANÊ KURDÎ LÊ TÊ AXAFTIN

Zimanê Kurdî di cîhanê de, ji wan zimanên herî kevnar in. Ji ber ku gelê Kurd ne gelek koçber e, di heman erdnîgariyê de hebûn û niştecihbûna xwe daye domandin, zimanê wî jî hebûna xwe parastiye. Her çiqas êrîşên neyaran di zimanê Kurdî de parçebûn çêkiribe jî û weke zarava jî, ji hevdu hatibin parçekirin jî lê nekarîne zimanê Kurdî yê kevnar ji holê rakin.

Mirov, dikare bêje zimanê Kurdî, zimanê herî kevnar e. Ji ber ku Awesta ya Zerdeşt bi zimanê Kurdî hatiye nivîsandin. Lê piştî hilweşandina dewleta Medan, zimanê Kurdan yê nivîsînê ji aliyê neyaran ve hatiye tinekirin û zimanê axaftinê ji ber dagirkeriya neyaran hatiye parçekirin. Ev bûye sedem ku di nav Kurda de sê cûrên (3) ABC’yan bên bikaranîn (Erebî, Latinî, Kirilî).

Her çiqas zimanê Kurdî, bindestî jiyankiribe jî lê taybetmendiyên xwe yên xwezayî û xweserî weke giştî zaravayên xwe parastiye û ABC’ya Latînî weke ABC’ya xwe daye pejirandin. Niha li Kurdistan, Anatolya, li gelek herêmên Ereban, Îran, Ermenîstan, Ewrûpa û gelek dewletên Sovyeta kevin bi şêweyê cûrbecûr zimanê Kurdî tê axaftin.

## ZIMANÊ AXAFTINÊ, ZIMANÊ NIVÎSÎNÊ Û BERÊN WÊ YÊN CÛRBECÛR

Ziman, zanist û teknîkên ji bo pêwîstiyên rojane bersiv bidin, derketine holê û pêşketinek mîsoger dane diyarkirin. Di encama van pêşketinan de, li ser zimanê rojane lê belê pêve girêdayî zimanê duwem derketiye holê. Ev di jiyana rojane û nivîsandinê de tên bikaranîn weke zimanê axaftin û nivîsinê, weke du parçeya ji hev hatine cudakirin.

### a- Zimanê Axaftinê

Zimanê axaftinê; karanîna bersivdayîna pêdiviyên jiyana rojane ye. Ji bo van pêdiviyan, mirov tim bi hev re, di nav danûstandinê de ne. Dema ku mirov rastî hevdu tên, livînên dest, mil, çav û rû dikevin nav zimanê axaftinê. Dema kesek daxive, piranî rastiya rêziman, avakirina hevokê nagire berçavan. Bi vê taybetmendiya xwe zimanê axaftinê, di hêla peyvê de, bi tixûp û di çêkirina hevokê de jî zimanek asayî ye. Lê belê ji ber rûberû tê bikaranîn germ û zindî ye.

Ziman hebûnek zindî û herikbar e, di pêşketina peydakirin û teknîka nû de bibandor e. Zimanê axaftinê jî para xwe ji vê digire. Lê belê dema peyvên weke telefon, Tv. Elektirik, computer û feza dikevin nav zimanê axaftinê, ji nav zimanê rojane dernakevin. Ev weke endamên dewlemendkirina zimanê axaftinê têne hesibandin. Ji zimanê bi awayê deng tên bi karanîn re **zimanê axaftinê** tê gotin.

### b- Zimanê Nivîsînê

Zimanê nivîsînê; xwe dispêre zimanekî axaftinê. Di navenda çandekê de, zimanê axaftinê yê herî resen weke zimanê nivîsînê tê

pejirandin. Di roja me de zimanê me, xwe dispêre xwezaya xwe, ji ber ku gelek herêmên me çiyayî ne, bandora zimanê biyanî li ser çênebûye. Zimanê xwe bispêre xwezayîbûna xwe, derfetên têgihiştinê firehtir dibin. Zimanê nivîsînê, bi endamên zimanê axaftinê yên herêmî xwedî dibe û digihe rewşek ya zimanê dewlemend. Lê belê di navbera zimanê nivîsîn û axaftinê de, di hêla peyv, pêvek û rêzkirinê de, hinek cudahî hene. Ji ber zimanê nivîsînê hêj bêhtir li gor destûrên ziman pêşdikevin, daxwaz ew e ku mirov cudahiyê di navbera zimanê nivîsînê û axaftinê de bike.

Zimanê nivîsînê, zimanê pirtûkê ye. Peyva pirtûk, li şûna hemû nivîsînên tên weşandin, hatiye bikaranîn. Her civaka ku dihizire û dinivîse, raman û hizirîn bi riya nivîsînê kom dibe û bermayên çandî derdikevin holê. Ev berma ji nivîsên pey xwe re dibe berhemek. Wateya zimanê nivîsînê, ji bo komkirin û hilanînê zimanek şayan e. Gencîneya herî mezin ya ziman, berhemên nivîskî ne. Dema çand tê gotin, ev berhemên nivîskî û giranbiha, di nava wê de tê têgihiştin. Gelê xwedî dîrok û çand qerdarê zimanê nivîsînê ne. Ger zimanê nivîsînê neba, tişta bi serê Kurdan hatî wê çawa bihata têgihandin? Çavkaniya berhemên çandî yên tên bikaranîn û mirov dikare bêje zimanê çandê bi xwe ye jî. Zimanê ji bo berhemên çandî, pîşe û nivîsîna welatekê re tên bikaranîn jê re **zimanê nivîsînê** tê gotin.

Çiqek ku zimanê axaftin û nivîsînê têkildar dike, heye. Bi demê re belavbûn û pêşketina zimanê Kurdî di Rojhilata Navîn de, di hêla deng, awa û wateyê de cudahiyek di navbera wan de hatiye dîtin. Di encama wan cudahiyan de destûrên wekî zimanê herêmî û zarave derketine holê.

## 1- Devokî

Devokî: Di gelek herêmên me de peyvên cûrbecûr yên newekhev tên dîtin lê di hêla rêziman de wekhev in. Her çiqas peyvên devokî ne

wekî hev jî bin lê bandorê li zimanê nivîskî nakin. Zimanê ku di herêmek biçûk yê welatekê de, bes girêdayî wê herêmê, di hêla deng de cudahiya dide diyarkirin jê re **devokî** tê gotin.

Devokî, dewlemendiyek ya zimanê nivîskî ye. Devokiyên Kurdistanê pir in. Weke devokiya Amed, Mêrdîn, Silêmanî, Kermanşah, Efrîn, Riha, Botan, Çewlik ...

## 2-Zarave:

Ji ber hinek sedemên dîrokî û ramyarî pêşketina ziman çêbûye. Di encama wan pêşketinan de, li herêmên cuda cuda, bikaranîna peyvên cuda û gencîneyên ziman yên cuda ji xwe re çêkirine. Bi vî awayî ev zarave ji hev cuda hatine pêşxistin. Ji van beşên ziman re **zarave** tê gotin.

Ji ber ku pêşketinên lezgînî çêbûne, dûrketina wan ya ji hev zêdetir bûye û her yekî wekî zimanekî hatine bikaranîn.

Ji ber vê sedemê kesên ku bi zaraveyên cuda daxivin, ji axaftinên hevdu baş tênagihin, bi vê boneyê carna şûna zarava peyva ziman tê bikaranîn.

Çar zaraveyê zimanê Kurdî hene:

**1- Kurmanciya jor**
**2-Kurmanciya Jêr (Soranî)**
**3-Dimilî (Kirmanckî-Zazakî)**
**4-Lorî**

## LÊKOLÎN

**1-Têkîliya di navbera ziman û civakbûyînê de çi ye? Vekin.**
**2-Pêşketina zimanê mirovan çawa çêbûye? Lêkolîn bikin.**
**3-Di pêşketina ziman de rista dayîkê çi ye? Lêkolîn bikin.**
**4-Kurtedîroka zimanê Kurdî lêkolîn bikin.**
**5-Zimanê cîhanê li gor têkîliyên çêbûn û çavkaniyê dibin çend beş? Vekin.**
**6-Malbata zimanên cîhanê çend in? Lêkolîn bikin.**
**7-Zimanê cîhanê li gor çêbûna xwe dibin çend beş? Vekin.**
**8-Zimanê Kurdî li kûderê tê axaftin? Vekin.**
**9-Zimanê axaftinê çi ye? Lêkolîn bikin.**
**10-Zimanê nivîsînê çi ye? Lêkolîn bikin.**

# BEŞA 2.

## PEYVÊN NAVDÊRÎ

**1- Nav**
**2- Hevalnav**
**3- Cînav**
**4- Hevalkar**

# XEBATÊN AMADEKARIYÊ

## Hûn dizanin her heyînek bi navekê tê naskirin.

### 1-Nav

Li gel gurubên peyvên bi wate, di nav hevokan de erk digire. Kirek pêkir, hevalkar û dibe salox.

Navê ku heyîneke pêşwazî dike; ger di nav hevokê de kareke bide rêvebirin dibe kirek.

**Mînak:**

**Amediyan** jî têkoşîn kirin.

Ger nav ji karê kirek bandor bibe dibe pêkir.

**Mînak:**

Ciwanan **pirtûk** xwendin.

**a-Nav, li gor taybetmendiyên heyînan dibe du beş:**

### 1- Navên Taybet

Gulistana Efrînî, li Rojavayê Kurdistanê rojnamevanî dikir.

Di hevoka jor de peyvên weke; Gulistan, Efrîn, Rojavayê Kurdistan ji ber ku di cîhanê de mîna wan û şibandina wan tineye, peyvên ku ji bo mirovan û cihan bûyîn nav hene. Weke van gel, welat, cih, ziman, ol, pirtûk, rojname, kovar, sazî, robar, derya û çiyayên naşibin hevdu. Ji ber vê çendê navên cuda cuda tên dayîn.

Ew navên ku heyîneke tenê didin naskirin jê re **navê taybet** tê gotin.

Navê taybet, di şibandina xwe de yan jî di mînandina xwe de weke wî navê taybet tine. Ji ber vê çendê heyînan tenê didin naskirin. Navên taybet her tim bi tîpa mezin tên destpêkirin.

Di hevoka we xwendî de peyvên weke Gulistan, Efrîn, Rojavayê Kurdistanê bi tîpên mezin hatine destpêkirin.

Navên taybet wiha tên sazûmankirin:

**Mînak:**

**Navê mirovan:** Bêrîvan, Aram, Gulîzar

**Binemal:** Bedirxanî, Mala Haco

**Navên nijadî:** Kurd, Faris, Ereb

**Navên saziyan:** YXK, YCK, TEV-DEM, KJB

**Navên welatan**: Kurdistan, Tirkiye, Îran

**Navên bajaran**: Amed, Şirnex, Kubanê, Mahabad, Hewlêr

**Navên herêman:** Botan, Behdinan, Soran, Cizîr,

## 2- Navên Giştî (Cins)

Wan pirtûkên xwe di baxçeyê dibistanê de xwendin.

Li ser peyvên di hevoka jor de yên weke pirtûk, baxçe û dibistan balder bin. Ev di cîhanê de tenê ne? Na. Mînandina wan gelek in. Ji komek yê heyînên wek hev re navek hatiye dayîn. Ji hemû pirtûkan re pirtûk tê gotin. Ji hemû baxçan re baxçe tê gotin. Ji hemû dibistanan re ji dibistan tê gotin.

Heyînên ku di heman birê de ji heman navan pêkhatî re **navên giştî** tê gotin.

## b-Nav, Li Gor Wateya Xwe Dibe Du Beş

### 1- Navên Şênber

Heyînên ku bi peyvên çiya, deşt, av, gelî û kevir têne nasîn heyînek ya wan diyar heye û bi çav tên dîtin, dest tên girtin û dîtinek ya wan ya berbi çav heye.

Navên ku ji bo wan heyînên ku em her pênc pêhesên xwe bi heyîna wan dihesin, tên bikaranîn re **navên şênber (heyberî)** tê gotin.

### 2- Navên Razber

Têgehên ku bi peyvên hezkirin, pêhes, başî, xemginî, maf, azadî, namûs û bawerî tên naskirin yan jî tên têgihandin, em nikarin bi yek pêhesên xwe heyîna wan tê bigihin.

Ji tiştên ku heyînên wan nayên dîtin lê belê bi riya hizirinê heyîna wan tên pejirandin re **navên razber (rewanî)** tê gotin.

## c-Nav Li Gor Jimara Xwe Dibe Du Beş

### 1- Navên Yekjimar

"Zarokan li daristanê gelek teba, firinde û xişinde dîtin, xem û hizrên xwe yên demborî bi wan re dan revandin û di vegera xwe de jî gelek lawirên sava (têjik, ferxik, çêlik) hêmbêzkirin."

Peyvên di hevoka jor de yên weke, "teba, firinde, xişinde" binê wan hatine xêzik dan, heyîn û têgihên bi van peyvan tên têgihandin yekin. Ji ber ku pêvekek van peyvan bike kom nîne. Ev, bê ku ti pêveka bigirin di rewşa xwerû de weke nav hatine bikaranîn.

Ji navên ku pêvekên komkirinê nestandî û heyînekê tenê didin diyarkirin re **navên yekjimar** tê gotin.

## 2- Navên

Peyvên ku di heman mijara jor de derbaz bûyîn yên weke "zarokan, hizrên û lawirên" ji ber ku gelek heyînan didin diyarkirin, navên pirjimar in.

Pêvekên "ên- an" navan dikin kom.

Peyvên ku ji heyînekê yan ji têgehekê zêdetir heyînan didin diyarkirin pêvekên ku "ên-an" standî jê re **navên pirjimar** tê gotin.

Di zimanê Kurdî de, carna pêveka kom dikeve li ser hindek navên giştî, ne ji bo kombûna nav, têgehên nû didin qezenckirin.

Ew jî ev in:

### 1- Zêdekirinê dide diyarkirin

Bêrîvan, çeka xwe dide milê xwe, li ber tava rojan digerine û diçe serê zinaran, li hemberê neyaran şer dike, ji serma zivistanan natirse.

Li gor roj yek bi tenê ye, ji peyva roj weke kom hatiye bikaranîn. Dîsa zivistan yek tenê ye lê kom hatiye bikaranîn. Li vir xwestiye zêdehiya germbûna rojê û sarbûna zivistanê bide diyarkirin.

### 2-Rêzdariyê dide diyarkirin

Mamoste! "Keremkin jor."

Li gor kesek bi tenê ye jî lê pêveka kom hatiye bikaranîn.

### 3-Wateya nêzîkbûnê dide diyarkirin

Di salên neh dehê de ye.

Ji ber ku neh û deh serê xwe pêveka komkirinê negirtine, pêveka "ên" ya ketî ser peyva sal, ne ku gelek salên neh û dehê hene, belkî dixwaze bêje jiyê wî/ê nêzîkî neh û dehê ye.

### 4- Meznahiya nav ê weke wan dide diyarkirin

Egîdan em gihandine roja îro.

Di vê hevokê de her çiqas Egîd yek be jî lê ji bo meznahiya nav pêveka kombûyînê standiye.

## d-Nav Li Gor Zayenda Xwe Dibe Du Beş:

### 1-Navên Mêza

Ew navên ku heyîn ekê mê dide nasîn re navên mêza tê gotin.

Di zimanê Kurdî de, tevayî heyîn li gor zayenda xwe tên destgirtin.

**Mînak:**

**Navên tiştan:** Pencere, dibistan, xak, pênûs.

**Navên şînahiyan:** Mêw, kulîlk, dar, hinar, gul, mêrg.

**Navên mirovan:** Gulistan, Bêrîvan, Nêrgiz.

**Navên lawiran:** Mih, mirîşk, mehîn, bizin.

### 2-Navên Nêrza

Ew navên ku heyînekê nêr dide nasîn re navên nêrza tê gotin.

Di zimanê Kurdî de, tevayî heyîn li gor zayenda xwe tên destgirtin.

**Mînak:**

**Navên tiştan:** Derî, kevir, xanî.

**Navên mirovan:** Azad, Şivan, Serbest.

**Navên lawiran:** Beran, dîk, nêrî.

Di zimanê Kurdî de, navên giştî hem nêr hem jî mê tên bikaranîn. Ji bo diyarkirina zayenda van navan pêvekên tewang "ê, î, a" tên bikaranîn.

**Mînak:**

Hevalî

Hevalê

Xwendekarê me,

Xwendekara me,

## *LÊKOLÎN*

**Heyf e mêr bimre nebîne**
**Sed birîn û ceng û şer**
*Hezin Kurdî*

**1**-Di malika jor de kîjan vebijêrkên jêr nîne?
a-Navên şênber
b- Navên taybet
c- Navên giştî
d- Navên yekjimar
e- Navên nêrza

**2**. Ji endamên hevoka jêr kîjan nenav e?
<u>Gerîla</u> <u>biharê</u> <u>diçin</u> <u>şerê neyaran.</u>
Kirek Têrker 1 Kar Têrker 2
a- kirek
b- kar
c- têrker 1
d- Têrkera 2
e- Daçek

**3**. Di kîjan vebijarkên jêr de bêhtir nav hene?
a- Xeyrî, Kemal û Bêrîvanan vale şer nekirine.
b- Zarok heya êvarî dilîzin.
c- Bêrîvan diçin bêriyê.
d- Em pirtûkan dinivisin.

e- Dar di biharê hêşîn dibin.

**4**. Kîjan peyvên di vebijarkên jêr de, pêveka "an, ên" ya komkirinê girtiye?

a- Zîlan û Ronahiyan vale têkoşîn nekirine.
b- Hogir, di salên pazde û şazde de ye.
c- Tava rojan nikare me ji xebatê bide dûrxistin.
d- Mamoste! "Keremkin jor."
e- Xwendekaran kom bikin û waneyê bidin wan.

## REWŞA NAVAN

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**Evîndarek bi hêviyên xwe re yar im**
**Dildarekê bi jiyana xwe re birîndar im**
**Di nav dil de**
**Agireke bêreng im**
**Dilkovan im ji karwanê jiyanê re**
**Pênûs im ji rastiya dirokê re**
**Bi navê îro şewirîme dilşad im**



### *DAXUYANÎ*

Di helbesta we xwendî de navên “pênûs, îro”, bêpêvek, navên ku “Evîndareke bi hêviyên xwe re/Dildareke jiyana di dil de/Agireke karwanê bi hizir û birên evîndariya, jiyanê” pêvek standine û hatine bikaranîn. Hûn dizanin pêveka "ên" ya kombûnê ye, pêvekên “a-ê-î-ek-o” û daçekên "bi-re, di-de, ji-re" li gel navan di nav hevokê de têkîliyê li gel peyvên din çêdike û sazdike.

Ji ber erkê navan yê di nav hevokê de ketina nav qalibekê jê re **rewşa navan** tê gotin.

Pêvekên ku van rewşan didin diyarkirin jê re **pêvekên rewşa navan** tê gotin.

Sê rewşên nav yên sereke hene:

1-Rewşa nav ya xwerû

2-Rewşa nav ya herikandî

3-Rewşa nav ya daçekî

## 1-Rewsa Nav Ya Xwerû

Ev nav ti pêvekên rewşa navan nagirin.

***Agir* geş dibe.**

***Hevalan hol li neyaran tengkirin.***

***Doza azadiyê, doza mirovahiyê ye.***

***Gel* bi serokatiya xwe serbilind e.**

***Dil* bi dilan şa dibe.**

***Kevir* û *kuç* li te bibarin.**

Navên di mînakên jor de binê wan hatîn xêzikirin, çi di rewşa kit de bin, çi di rewşa kom de bin; pêveka komkirinê standî bin jî, ji ber ku pêveka rewşa navan nestandiye, di rewşa xwerû de ne.

Ger nav, pêveka rewşa nav nestandî be, jê re rewşa nav ya xwerû tê gotin.

## 2- Rewsa Nav Ya Herikandî

Rewşa navan ya herikandî, di nav xwe de dibe çar beş.

**a) Rewşa navan ya herikî ya zayendî**

***Rengê gulê pir ciwan e***

***Sosin û Beybûn jêr heval e***
***Ya ditirê ez nasnakim***
***Ser çiyayî xweş heval e.***

Weke di malika jor de tê dîtin peyva "gul û çiya" di pêvekên zayendî de (ê-î) ji rewşa xwe ya xwerû derketine û ketine rewşa navan ya herikiya zayendî.

Ew navên xwerû yên ku pêveka zayendî ya nêr û mê standîn û zayenda wan dayî diyarkirin re rewşa navan ya herikî ya zayendî tê gotin.

**b) Rewşa navan ya herikî ya palvedanê**

***Gula deştên ciwan e***
***Ya çiyayî ciwantir e***
***Gotinekî bi rastî***
***Ji hirt hirtê çêtir e.***



Di malika jor de peyva deşt û pêveka palvedanê "ên" standiye û ketiye rewşa nav ya herikî ya palvedanê.

Her wiha peyva çiyayî jî pêveka palvedana "î" girtiye û ew jî ketiye heman rewşê de. Ji ber ku rewşa wan ya xwerû "deşt û çiya" bi zeliqandina pêvekan, rewşa wan hatiye guhertin.

**c-Rewşa navan ya herikî ya bangî**



**Xezalê mazî çinê,**
**Demê ez ban te bikim**
**Cewabê li min nede**
**Hevalo delalo heta bihar bû**
**Li Wanê warkozê te deyne kir**
**Îro biharê mihelê malan û jêkbina**

Dema em temaşeyî peyvên di malika jor de dikin, dibînin ku pêveka bangî "o, ê" girtine û bi vî awayî ketine rewşa navî ya herikî ya bangî de.

Dema ku navek pêvekên bangî digre û rewşek bangî dide peyvê re **Rewşa nav ya herikî ya bangî** tê gotin.

### d- Rewşa navan ya herikî ya nediyar

**Havînek germ e**
**Peyiz te nerm e**
**Zivistan nîne**
**Bihar bi rehm e**



Dema em temaşeyî peyva "havînek” dikin, dibînin ku pêveka nediyar "ek" girtiye û ketiye rewşa navan ya nediyar de.

Ji vê rewşê navan re, **rewşa navan a herikî ya nediyar** tê gotin.

## 3- Rewsa Navan Ya Dacekî

Rewşa navan ya daçekî dibin şeş beş:

### a-Rewşa navan ya daçekî ya têdeyî

**Di dil de ez evindar bûm**
**Ji lewra ez pir bêhal bûm**
**Ji mêlakê birîndar bûm**
**Ji ber wê pir bêhal im ez**



Dema em temaşeyî malika jor dikin, dibînin ku peyva "dil" daçeka "di" paşdaçeka "de" girtiye û ketiye rewşa daçekiya têdeyî, ji ber ku

dema "di-de" navekî dixin navbera xwe û didin diyarkirin ku karê hatî kirin, di wî navî de hatiye kirin.

**b- Rewşa navan ya daçekiya tevayî**

Di demsala biharê de pezkuvî, bi karikên xwe ve li çiyayê Kurdistanê dijîn.

Dema em temaşeyî benda jor dikin, dibînin ku daçeka "bi-ve" li ser navê karik hatine bikaranîn û rewşa tevayî daye nav.

Ji ber ku dema daçeka "bi" û paşdaçeka "ve" dikevin li ser navan didin diyarkirin ku tevaya kar hatiye kirin.

**c- Rewşa navan ya daçekiya pêreyî**

Rojekî dîk, kew û ordek bi rovî re derdikevin rê, dema dibe êvar, rovî ji wan re dibêje: Em tûbedar in, ji ber wê pêwîst e, em xwe bixin kunekê, da ku tebayên durinde me nexwin. Dema dikevin kûnê rovî dibêje: Ez bûme gunehkar, ez ê bibim nobedar.

Dema em temaşeyî benda jor dikin, dibînin ku daçeka "bi" û paşdaçeka "re" ketiye ser navê rovî û dide diyarkirin ku navên din bi wî re çûne.

Ji ber vê çendê, em dibêjin dema daçeka "bi" û paşdaçeka "re" dikevin li ser navekê rewşa pêreyî didin wî navî.

**d- Rewşa navan ya daçekiya jêreyî**

Dema em temaseyî benda jor dikin, dibînin ku daçeka "ji- re" ketine li ser cînavê kesî û rewşa jêreyî daye vî navî. Dema ev daçek û paşdaçeka xwe dikevin li ser navekî rewşa jêreyî didin van navan.

**e- Rewşa navan ya daçekiya alî**

Dema ku ji bakur ve şilî dest pê dike, piştî rojek - du rojan bandora xwe li başûr dike.

Dema em temaşeyî benda jor dikin, dibînin ku daçeka "ji-ve" ketiye li ser navê bakur û aliyê wê dide diyarkirin.

**ê-Daçeka serbest**

Li zozanan berf pir dibare û li deştê jî baran dibare.

Dema em temaşeyî benda jor dikin, dibînin ku daçeka"li" ketiye li ser navê zozanan û deştê, cihê bûyerê dide diyarkirin.

## PIRSÊN NIRXANDINÊ

Rojekê em li dibistanêbûn; rêvebirê Mexmûr bi mamostayan ve hatin dibistanê, ajoyê wan jî bi wan re bû, xwestin ku em bi hev re alîkariyê bikin. Ev daxwaz ji aliyê mamostayan ve jî bi erênî hat pêşwazîkirin.

**1**-Di benda jor de kîjan rewşa navan ya daçekî nîne?

a) -Rewşa navan ya daçekiya têdeyî
b)-Rewşa navan ya daçekiya pêreyî
c)-Rewşa navan ya daçekî ya alî
d)-Rewşa navan ya daçekî ya jêreyî
e)-Rewşa navan ya daçekî ya serbest.

**2**-Di vebijarkên jêr de daçek û paşdaçekên binê wan hatine xêzikdan kîjan navî dixe rewşa têdeyî de.

a)Min di xew de dît
b) Ew li ser ban bûn
c) Dilgeş bi hevalê xwe re bû.
d)Têkoşîn bi hevalê xwe ve hatiye.
e) Daxwaza min ew e ji aliyê wan ve nexweşî derketibin.

**3**- Di kîjan vebijarkên jêr de rewşa navan ya zayendî nîne?

a) Gulê ji Egîd re got were vir.
b) Egîd gotina wê ne pejirand.
c) Lê dem derbaz bû, Gulê carek din dixwest Egîd bibîne.
d) Vê carê Egîd daxwaza Gulê pejirand.
e) Egîd bi Gulê re hevdîtinek pêkanî.

**4** -Di kîjan vebijarkên jêr yên binê wan hatîn xêzikdan de pêveka nediyar heye?

a) Gula baxê min hejar e,
b) Bihara dilêm xedar e,

c) Biharek xweş jiyan bikin,
d) Dara jiyanê bi xwînê tê avdan,
e) Avhinar miz e.

**5-** Di kîjan vebijarkên jêr yên binê wan hatine xêzikdan de rewşa pêreyî heye?

a) Dilê me birîn e.
b) Dîrokzanê mezin Rêber Apo ye.
c) Di dîrokê de mafê Kurdan nehatiye dayîn.
d) Bi jiyanê re gelê me pêşdikeve.
e) Ji kîjan neyaran me xirabî nedît?

**6-** Di kîjan peyvên binê wan hatine xêzikdan yên di vebijarkên jêrîn de rewşa navan ya herikî ya palvedayî heye?

a) Egîd gul çandin
b) Gulê were bêriyê.
c) Havîna germ zor e.
d) Çiyayê Gabarê nerm e
e) Azadî ji zarokatî dest pê dike.

## NAV LI GOR ÇÊBÛNA XWE

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

***Xortên me Kurdan hûn werin***
***Da em herîn ceng û şerî***
***Dijmin ji me qet nagerî***
***Talankirin mal û serî***
***Ta kengî em bibin xewar***
***Rabin ji xew bibin şiyarî***

### *DAXUYANÎ*

Nav li gor çêbûna xwe dibin sê beş:
1-Navên xwerû
2- Navên darîştî
3- Navên hevgirtî

### 1- Navên Xwerû

Çend peyvên di malika jor de em lêkolîn bikin.

"Xortên Kurdan" peyva "xort" pêveka komkirina navan "ên" standiye. Peyva "Kurd" pêveka komkirina navan "an" standiye. Peyva "Dijmin" pêvek nestandiye. Dema em van pêvekên kişandinê ji navan cuda dikin; yên weke, "xort", "Kurd" û "dijmin" dimîne.

Ev navên, di rewşa kok de ne tên bikaranîn. Dema em temaşeyî rêzên din jî dikin, peyva weke "ceng" wisa ye. Ev nav, hevgirtin bi ti pêvekên sazker re çênekiriye û bi peyvek din ve nezeliqiye.

Ew navên ku ti pêvekên sazker negirtî û hevgirtin bi peyvek din ve çênekiriye. Weke di rewşa kokê de hatine bikaranîn jê re **navên xwerû** tê gotin

## 2- Navên Dariştî

***Bi derketina rojê re, teyê rûyê xwe vekira***
***Û bi kenê evînê li min binêriya***
***Minê li dengê bilbilên te guhdarî kirîba***
***Gula min***
***Bi demê rojava re jî***
***Teyê bejna xwe li ber bayê min***
***Bi nazdarî bihejanda***
***Û xatir bixwesta***
***Piştre li ber strana min biketiba xewê***
***Xeweke şîrîn***
***Li nav taviyên xunavê***
***Ez jî bibûma hêşadarê te***
***Zêrevan li ber xemil û xêla te***
***Heya xwediyê te, roja bişewq***
***Careke din silav bida me.***



Di helbesta jor de, em çend peyvan bigirin û lêkolîn bikin. "Guhdar, hêşedar û zêrevan". Van navan hevgirtin bi pêvekên sazker "dar, van" re çêkiriye û navek nû hatiye afirandin.

Navê "guh" bi pêveka sazker ya "dar" re hevgirtin çêkiriye û wateyek nû daye wî navî. Peyva "zêr" bi pêveka dariştî ya "van" re hevgirtin çêkiriye û bûye navek dariştî.

Ew peyvên ku pêvekek sazker standî û wateyek nû bi peyvê dayî qezenckirin re **navên dariştî** tê gotin.

## Cûrên Navên Daristî

Navên dariştî li gor kokan tên tûredan û pêveka digire li gor van beşan ji hev tên cudakirin:

### a) Navên ji nav sazdibin:

1- Bêrîvan çû bêriyê.
2- Solbend solên xwe firotin.
3- Sazbend sazûmaniya cîhê xwe çêkir.
4- Guhdar ji guhdarvaniyê hez dike.

Dema em temaşeyî hevokên jor dikin, dibînin ku navek bi alîkariya pêvekên sazker, navek nû hatiye afirandin.

Dema koka nav, pêvekek sazker bistîne, navek nû tê afirandin.

Navê "Bêrî", pêveka sazker ya "î,van" standiye, navek nû çêkiriye.

Navê "sol" pêveka sazker ya "bend" standiye navek nû afirandiye.

### b) Navên Ji Karekê Sazdibin:

**Mînak:**

Xwend + in = Xwendin

in- Xwendin tiştekî pîroz e.

în- Birîna daran li welatê me qedexe ye.

n- Ji danê xweştir tiştek nîne.

Dema em temaşeyî jor dikin , dibînin ku pêvekên raderî yên sazker bi kar ve zeliqîne û navek nû hatiye afirandin.

Wek "xwend" pêveka sazker ya "in" standiye û bûye dariştî.

## 3- Navên Hevgirtî

### ŞÎRETA MIN

*Cangorî be kurê mino!*
*Taku saxî dem û gavê*
*Şareza be kekê mino!*
*Da nekevî qeyd û davê*
*Bese êdî heya kengê*
*Berevajî biçî ravê*
*Berde rêça çewt û kirêt*
*Xwe derxîne ji tengavê*
*Hilû rabe bilind hilde!*
*Al û xetîra bizavê*
*Nezîrek û nezanabê*
*Tu ketî bûtka bişavê*

*Sebrî Botanî*



Dema em temaşeyî helbesta jor dikin, dibînin ku navê binê wan hatî xêzikdan ji du navan pêkhatine. Navê "can" hevgirtin bi peyva "gorî" ve çêkiriye, peyva cangorî hatiye afirandin.

Bere+vajî = Berevajî

Di zimanê Kurdî de, ji duwem zêdetir hevgirtina peyvên ji wateya xwe ya bingehîn cuda dibin û weke navên tiştekî din tên bikaranîn re **navên hevgirtî** tê gotin.

**Navên Hevgirtî Di Nav Xwe De Dibin Çar Beş:**

**1- Navên Hevgirtî Yên Ji Navan Çêdibin**

Dema du nav hevgirtinê bi hev re çêdikin û ji bo wateyeke nû tên bikaranîn re **navên hevgirtî yên ji navan çêdibin** tê gotin.

**Mînak:**

a) Marmasî mîna masiyan di avê de dijîn.

b) Tevnepîr mala xwe ji tevnê çêdike.

Dema em temaşeyî peyva "marmasî, tevnepîr" dikin, dibînin ku ev nav ji du navan pêkhatine. Ji ber di bingeh de mar-e-masî û tevn-e-pîr, piştre veqetandek ji nava wan rabûye û weke navê heyînek cuda dayîne afirandin.

### 2-Navên Hevgirtî Yên Ji Nav û Hevalnavan Çêdibin

1- Soredar darek ya çiyayên Kurdistanê ye.

2- Sorgul xwendekarek jîr e.

3-Rûkenê pirtûk xwend.

4-Dilgeş nivîsîn nivîsî.

Dema em temaşeyî mînakên jor dikin, dibînin navên hevgirtî ji hevgirtina nav û hevalnavekê pêkhatiye. Ji ber di bingeh de "dara-sor e, gula-sor e" piştre veqetandek radibe, hevalnav tê pêşiya nav û hevgirtina herdu peyvan çêdibe û navekî hevgirtî tê afirandin.

Di hevokên jor de, peyva Rûken û Dilgeş, di bingeh de "Rûyê bi ken e, Dilê bi geş e", veqetandeka wan rabûye û navekî hevgirtî derketiye holê.

### 3-Navên Hevgirtî Yên Ji Nav û Karekê Çêdibin

a-Kedxwaran li ser gel zordarî kirin.

b-Xwînxwarên welatê me pir in.

c-Rûhat, gul çandin.

d-Gelhat bizin çêrandin.

Dema em temaşeyî peyvên "kedxwar, xwînxwar, Rûhat û Gelhat" dikin, em dibînin ku ev her çar nav, her yek ji wan jî ji du peyvan pêkhatiye û yek nav, yek jî ji kar pêkhatiye.

### 4- Navên Hevgirtî Yên Ji Du Karan Çêdibin

- <u>Çûman</u>, navçeyek ya bajarê Silêmaniyê ye.

- <u>Herewer</u> çû dibistanê.

Dema em temaşeyî van herdu hevokên jor dikin, dibînin ku peyvên binê wan hatine xêzikdan navên hevgirtî yên ji du karan pêkhatine. Ji ber dema em van herdu karan parçe dikin, her parçeyek

bi serê xwe kar e. Ev herdu kar bi hev ve hatine danîn û bûne navê heyîneke din.

## LÊKOLÎN

**1**- Navên ku pêveka sazker girtî em ji wan re dibêjin navê darîştî. Li gorî vê raveyê kîjan vebijarkên jêrî navê darîştî ye?

a-Dar b-av c-hewa d- nan e-çiyayî

**2** - Kîjan vebijarkên jêr navê ji navekê bûye darîştî?

a) Darvan çûn daran.

b) Sorgul diçin bêriyê.

c) Çûman navçeyek e.

b) Dilgeş hêja ye.

e) Rûken rûbiken e.

**3**- Di kîjan vebijarkên jêr de navê hevgirtî yê ji nav û karekê pêkhatiye?

a-Gulistan

b- Goristan

c-Cegerxwîn

d-Rûsîda

e-Gamasî

## HEVALNAV

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

Kesên li dibistanê hûn hev nasdikin hene? Lê hûn navê hev nizanin, wî/ê hevalê xwe yê tu navê wî nizanî tuyê bi kesek din çawa bidî naskirin? Bi diyarkirina hinek taybetiyên wî/ê yên ji derve mane? Mînak bêjin kin, zirav dirêj, çavsîn, bi berçavik û rûken.

Dema hûn tiştekî bidin nasîn yan jî di derbarê cihekî de nivîsînekê dinivîsin, hûnê wan taybetmendiyên tiştan li ber çavan bigirin. Ger peyvên wan taybetmendiyan didin diyarkirin neba, meyê çawa hevalê xwe, tişt û cih bi kesên din bida nasîn?

Belê di vê rewşê de, peyvên jê re dibêjin hevalnav, ji we re dibin alîkar. Niha jî mijara li jêr, bibaldarî bixwînin. Balê bikişînin li ser peyvên binê wan hatine xêzikdan, kîjan taybetmendiyên heyînên li pêşiya xwe dane diyarkirin.

## DAXUYANÎ

Ji ber peyvên "zer, reş û şîn" taybetmendiyê heyînekê dane diyar kirin, weke hevalnavan hatine bikaranîn.

Gulên sor, şîn û zer yên biharê, welatê me dixemilînin.

Di zimanê me de, di navbera nav û hevalnavan de bikaranîna veqetandekê pêwîst e. Pêveka kom ya weke veqetandekê hatî bikaranîn jimara navan dide diyarkirin. Ger di navbera çend hevalnavan de jî bê, weke hevalnavên pêvek standî nayê pejirandin (hesapkirin).

Ji ber li rex her veqetandekê jî di bingeh de navek veşartî heye.

"Gelê Kurd li ser çiyayên bilind yên Kurdistanê li hember êrişên dijmin xwe diparêzin. Dijminê Gelê Kurd daristanên kesk dişewitînin, çekên kimyawî bikartînin, mirovên nîştîmanperwer digirin û dikujin. Li hember wan bazên tolhildanê berxwedana xwe ya lehengî bi awayekî serbilind berdewam dikin û gelê xwe diparêzin."

-Peyvên ku taybetmendiyên heyînan diyar dikin, bi awayek nediyar dide nasîn, jê re **hevalnav** tê gotin.

Hevalnav her tim li gel navan tên. Ji bo peyv bibe hevalnav, pêwist e taybetmendiyek diyarker yên peyvên pêşiya xwe bidin diyarkirin. Ji birepeyvên ji nav û hevalnavekê pêktên re **raveka hevalnavan** tê gotin.

-Zer asiman, reş, ax, şîn, dar

Di rêzepeyvên jor de ji ber peyvên “zer, reş û şîn” taybetmendiyê heyînekê nedane diyarkirin, weke navan hatine bikaranîn. Ev peyvên ku kokên xwe hevalnav in, weke nav hatine bikaranîn, dikarin pêveka kêşanê bistîne.

***Şiyarî:***

***Dema ku em dibêjin hevalnav pêveka kêşanê nagire, divê em bi vê peyva pêveka sazker girtî û bûyî hevalnav neyên xapandin.***

***Mînak:***

***Evîndar***

Dibe ku ji yekî zêdetir taybetmendiyên wan hebin. Di vê rewşê de peyvên ku taybetmendiyên wê heyînê didin diyarkirin, bi rêzê ve tê nivîsîn û di navbera wan de bêhnok tê bikaranîn.

**Mînak:**

"Min li ser pirê, mirovek bejinbilind, çavreş û rûken dît."

Di vê hevokê de taybetmendiyên mirovek yên wekî; bilindbûna bejnê, reşbûna çav û rûkeniya rûyê wî bi rêzê ve taybetmendiyên wî hatine dayîn. Hinek nav ji ber ku taybetmendiyên kesekê didin diyarkirin û mînandinên çêdikin dibin hevalnav.

**Mînak :**

Egîdê Zêrîn ji bo Kurdan têkoşînek dijwar da.

Di vê hevokê de peyva " Zêrîn " navek e lê ji ber ku Egîd weke Zêrîn daye mînandin bûye hevalnav.

## A-HEVALNAV LI GOR AWAYÊ BIKARANÎNA XWE

**Hevalnav di nav xwe de dibin sê beş:**

### 1-Hevalnavên Çawaniyê

Di nivîsîna jêr de, peyvên binê wan hatîn xêzkirin çawabûna navan bi me dane diyarkirin? Van peyvan bi baldarî bixwînin.

**Gula sor xweş e.**
**Gula reş heş e.**
**Ya zer geş e.**
**Ya şîn beş e.**
Bi van re Kurdistan geş e.

Di mînakên jor de peyvên "sor, reş, zer û şîn" çawabûna rengê gulê dane diyarkirin.

Hevalnavên çawaniyê di nav xwe de dibin du beş:

#### a-Hevalnavên Rengdêr

Ev cûrê hevalnavan rengên navan dide diyarkirin.

**Mînak:**

Kêvroşka spî gêzeran dixwe.
Pisîka Wanê ya çavzer û şîn ciwan e.

#### b-Hevalnavên Rewş û Awa

Mirovê baş, ji mirovê xirab bi rûmetir e.

Dema em temaşeyî vê hevoka jor dikin, dibînin ku peyvên "baş û xirab" çawabûna navan di hêla rewş û awa de daye diyarkirin.

Hevalnavên çawanî bi awayeke giştî taybetmendiyên navan yên demdirêj didin diyarkirin.

## 2- Hevalnavên Diyarkirinê

Dema em temaşeyî hevokên jêr dikin, dibînin ku peyvên binê wan hatî xêzkirin, nav dayîne diyarkirin.

**Mînak:**

Çar xwendekaran bi hev re ew pirtûk xwendin.

Azad, ji çaran sêyên nivîsîna xwe nivîsîbû.

***Hevalnavên diyarkirinê dibin sê beş:***

### a-Hevalnavên Nîşandanê

Ger gelê Kurd ev zanîn, ev hêz û ev biratî nebûya van neyaran dê ev xak ji Kurdan paqij bikira.

Dema em temaşeyî benda jor dikin, dibînin ku peyvên binê wan hatî xêzkirin nav dayîne diyarkirin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Zanîn | Ev zanîn |
| Neyaran | Van neyaran |
| Xak | Ev xak |
| Hêz | Ev hêz |
| Biratî | Ev biratî |

Ev hevalnavên ku navan di hêla dûr, nêzîk û zayendê de didin diyarkirin ji wan re **hevalnavên nîşandanê** tê gotin.

## Pêşdariya Hevalnavên Nîşandanê

| | Hevalnavên N.nêzîk nêr û mê | Hevalnavên N.dûr nêr û mê | Hevalnavên N. zayendan nêr | Hevalnavên N. zayendan mê | Hevalnavên N. zayenda nêr û nêzîk | Hevalnavên N. zayenda mê û dûr |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Yekjimar | Ev | Ew | Wî | Vê | Vî | Wê |
| Pirjimar | Van | Wan | | | | |

## b-Hevalnavên Jimarî

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**Heft xwendekaran, bi heft zimanî bi heft rengan nivîsîn nivîsandin. Ev xwendekar di refa heştê de dixwînin. Ji van hevalan, Dilgeşa yekemîn ji tevan jîrtir e. Lê xwendekarên me ji dehan pencên wan di refê de serkeftîne.**

## b-Hevalnavên Jimarî

### *DAXUYANÎ*

Dema em temaşeyî mijara jor dikin, peyvên binê wan hatine xêzkirin jimara navan didin diyarkirin ji wan re **hevalnavên jimarî** tê gotin. Hevalnavên jimarî, jimara heyînan didin diyarkirin.

Hevalnavên jimarî di nav xwe de dibin sê beş:

### I-Hevalnavên Jimara Xwerû

Dema îro Kovan ji bajêr hatî, wekû diyarî ji hevalên xwe re çar pênûsên risasî, şeş lênûs, du pirtûk û çardeh pênûsên hibir anibûn.

Dema em temaşeyî mijara jor dikin, hevalnavên ku binê wan hatine xêzkirin, bi jimara xwerû, jimara nav dane diyarkirin.

Ew Hevalnavên ku jimara heyînan didin diyarkirin jê re **hevalnavên jimara xwerû** tên gotin. Hevalnavên jimara xwerû, ji jimara sifirê (0) destpêdike, heya bêdawî diçe.

## II-Hevalnavên Jimara Rêzê

Nûdaya yekemîn îro têkîliyek li gel Nêrgiza çaremîn çêkir û herdu bi hev re çûn serdana Nûbihara nexweş.

Dema em temaşeyî hevoka jor dikin, peyvên binê wan hatine xêzkirin ji ber ku pile û rêza nav dane diyarkirin, hevalnavên jimara rêzê ne.

Ew hevalnavên ku pile û rêza heyînan didin diyarkirin jê re **hevalnavên jimara rêzê** tê gotin.

Piranî jimara xwerû li gel pêveka "emîn" hevgirtinê çêdike, jimara pile yan jî ya rêzê derdikeve holê.

## III-Hevalnavên Jimara Kertî

Ji sêyan yekê germahiya Cizîrê di rojek ya zivistanê de tê jibîrkirin.

Ji sedan sed berxwedana YPG'ê li Rojava serket.

Dema herdu hevokên jor temaşe dikin, peyvên "ji sêyan yekê", "ji sedan sed" navan, ji tevayiyekê, parçeyekê dide diyarkirin.

Ew hevalnavên ku li gor tevayê jimara parçeyên heyînan didin diyarkirin jê re **hevalnavên jimara kertî** tê gotin.

## c-Hevalnavên Pirsvarî

Kîjan xwendekarî pirtûk negirtibû?

Çend xwendekaran pirtûk girtibûn?
Kî mirov çûbû Amedê?
Wan pirtûkek çawa xwendibûn?

Dema em temaşeyî hevokên jor dikin, peyvên "kîjan, çend, kî, çawa" li gel navan hatine û rewşek ya pirsyarî dayîne navan û temamkirine. Hevalnavên ku di hêla pirsyarî de navan didin diyarkirin re **hevalnavên pirsyarî** tê gotin.

Ew hevokên ku di nav wan de hevalnavên pirsyarî heyî li dawiya wan hevokan de hêmaya pirsê tê bikaranîn.

## 3-Hevalnavên Nediyar

Hindek heval bikarê pirtûk çekirinê ve xerik dibin, hinek heval jî tevlî perwerdeya branşê dibin, hin heval jî ji bo xwe kar dikin.

Dema em temaşeyî hevokên jor dikin peyvên "**hindek, hinek, hin**" bi awayekî diyar jimara heyînan nedane diyarkirin. Di van cûrê hevalnavan de kifşkirina jimarê nîne. Lê belê nediyarî heye.

Hevalnavên ku jimar û awayê heyînan bi awayekî nediyar, didin diyarkirin re **hevalnavên nediyar** tê gotin.

## B-HEVALNAV LI GOR ÇÊBÛNÊ

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**Di mijara jêr de, peyvên binê wan hatine xêzkirin li gor çêbûna wan lêkolîn bikin.**
**Mamosteya <u>dilovan</u>, ji xwendekarên <u>pir</u> biçûk, pir hezdike.**
**Lê hezkirina wê ya ji xwendekarên <u>biçûk û jîr</u> re hêj zêdetir e.**
**Evîndara <u>çavbelek</u>, di refa xwe de pir tê hezkirin.**

### *DAXUYANÎ*

Dema em hevokên jor dixwînin û temaşe dikin, peyvên binê wan hatine xêzkirin, di hevoka yekem de peyva **"dilo"** pêveka sazker **"van"** standiye û bûye **"dilovan**" û tûredaye û rewşa mamoste daye diyarkirin. Di heman hevokê de hevalnavên "**pir û biçûk**" li gel hev hatine û rewşa xwendekaran dide diyarkirin û hevalnavê paye pîv e. Peyvên, "**pir biçûk**" tê wateya biçûktir e.

Di heman hevokê de, hevalnava **"biçûk û jîr**" ji ber ku weke peyvek asayî, bûne hevalnav ji wan re **hevalnavên xwerû** tê gotin.

Di hevoka duwemîn de, peyva "**çavbelek**" ji ber ku ji du peyva pêkhatiye û çawabûna nav daye diyarkirin, bûye hevalnavê hevgirtî.

***Hevalnav li gor çêbûna xwe dibin sê beş:***

| Hevalnavên Xwerû | Hevalnavên Dariştî | Hevalnavên Hevgirtî |
|---|---|---|
| Xwendekarên jîr | Azadê dilovan | Keça çavbelek |
| Gelek pirtûk | Mirovên dildar | Hozanê cegerxwîn |

## 1- Hevalnavên Xwerû

"Raperîna bejinzirav, îro ew kelha navdar dît, bi dîtina **wê** kelhê re xurûşek **mezin** pêre peydabû. Ew xurûşa pê re peyda bûyî di heman demê de bandorî li ser **hin** hevalên wê jî kir."

Di mînaka jor de peyvên "**mezin, wê, hin"** ti pêvekên sazker nestandine. Ev peyv, di rewşa kokê de hatine bikaranîn.

Ew Hevalnavên ku pêvekên sazker nestandîn, hevgirtin bi peyvek cuda re çênekirî yan jî ji koma pêknehatî jê re **hevalnavên xwerû** tê gotin.

## 2-Hevalnavên Darişţî

Rojîna evîndar, çû mal.

Cegerxwinê dildar, helbestên xwe hemû li ser evîna welat sazkirine.

Di hevokên jor de li ser peyva "**evîn"** pêveka sazker "**dar"** zêdebûye û peyv hatiye tûredan, bûye "**evîndar**". Di hevoka duwem de, peyva "dil" pêveka sazker "dar" zêdebûye û peyv hatiye tûredan, bûye "dildar".

Hogirê solbend, solên xwe bi erzanî firotin.

Dema em temaşeyî hevoka jor dikin, peyva "sol" pêveka sazker "bend" zêdebûye û peyv hatiye tûredan, bûye "solbend."

## 3- Hevalnavên Hevgirtî

Hemû peyvên hevgirtî yên dikarin erkê hevalnav bikin, jê re **hevalnavên hevgirtî** tê gotin.

Hevalnavên hevgirtî, li gor çêbûna xwe dibin çar beş:

### a- Hevalnavên Ji Nav û Hevalnavekê Pêktên

Egidê **bejinbilind**, îro di baxçeyê gulan de, gul çandin.

Rewşena **çavbelek**, dariştinek li ser xwezayê nivîsî.

Dilovanê **çavreş**, bi keda xwe ve girêdayî ye.

Rûkena **rûgeş**, dilpak e.

Dema em temaşeyî her çar mînakên jor dikin, dibînin ku ji nav û hevalnavekê pêkhatine û bûye hevalnavek hevgirtî.

### b- Hevalnavên Ji Du Hevalnavan Pêktên

Tirêjên **keskesor**, li esîmanan çêdibin.

### c- Hevalnavên Ji Nav û Hevalkarekî Pêktên

Karê **pargîsk**, îsal kûre.

### d- Hevalnavên Ji Hevalkar û Karekê pêktên

Gula **demborî**.

Dexla **dûhçandî**, îro şîn dibe.

### HEVALNAVÊN PAYEPÎV

Hozan karê **baş** dike.

Gulistana ciwan, karê **baştir** dike.

Hogir karê **baştirîn** dike.

Dema em temaşeyî hevokên jor dikin, pîvana başiya navan didin zanîn. Pileya di navbera sê navan de dipîve.

### HEVALNAVÊN BIREPEYV

Ala kesk sor û zer, ala Kurdistanê ye.

Kesên rast û durist, ji rastiyê dernakevin.

Dema em temaşeyî hevokên jor dikin, dibînin ku birepeyvên binê wan hatine xêzkirin, bûne hevalnavê navekê.

Ev birepeyvên ku dibin hevalnav, ji wan re **hevalnavên birepeyv** tê gotin.

## LÊKOLÎN

**1- Di hevoka jêr de, birepeyva binê wan hatî xêzkirin, kîjan vebijêrka jêre?**

Wan çar sed û pêncî û pênc peyv ji parêznameya Rêber APO girtin.

a-Hevalnavên jimarî yên jimara xwerû

b- Hevalnavên pirsyarî

c- Hevalnavên payepîv

d- Hevalnavên jimara rêzê

e- Hevalnavên jimara kertî

**2- Di hevoka jêr de hevalnavê, binê wê hatî xêzkirin, kîjan vebijêrka jêre?**

Di beyaniyê de Bêrîvana baş diçe bêriyê.

a- Hevalnavê çawaniyê

b- Hevalnavê nîşandanê

c- Hevalnavê hevgirtî

d- Hevalnavê jimara kertî

e- Hevalnavê jimara rêzî

**3- Ji van vebijarkên jêr kîjan hevalnavê çawaniyê ye?**

a- Çiyayê kesk di biharê de tên dîtin.

b- Bayê êvarî xweşe.

c- Vê gulê bîne.

d- Çar heval li hember bi hezaran leşker şer dikin.

e- Dîlana yekemîn.

**4** -Di vê malika jêr de hevalnavên weke nav hatin bikaranîn çend in?

**Gula reşiyê delal e,**
***Dengê zerê heval e,***
***Rûyê delalê bi xal e,***
***Ji ber wê dilê min dikale.***a-
1- b- 2- c-3- d-4- e-5-

**5- Kîjan Hevalnavên li jêr, ji yên din cuda ye?**
a- Havîna germ
b-Giyayê şîn
c- Derya kûr
d- Hozanê dirêj
e-Vê pirtûkê

**6-Di kîjan vebijêrkên li jêr de peyvek ne hevalnav e lê weke hevalnav hatiye bikaranîn?**
a) Derya çavşîn banî min dike.
b) Ev çend roj in ez li benda wa me.
c) Hozanê mamosta dinivîse.
d) Gula sor li çiyayê Kurdistanê şîn dibe.
e) Rêberê gelê Kurd, parêznameyên xwe yên zanistî li giravê nivîsîn.

**7- Hevalnavê di hevoka li jêr de hatî bikaranîn di hêla çêbûnê de çi cûrê hevalnavan e?**
***Darayê Hêvidar ji bo xwe dixebite***.
a-Hevalnavê xwerû
b- Hevalnavê Rengdêr
c- Hevalnavê hevgirtî
d- Hevalnavê darişţî
e- Hevalnavê Çawaniyê

**8- Di vebijêrkên li jêr de kîjan hevalnav li gor çêbûna xwe ji yên din cudatir e?**

a- Nêrgiza çavreş şoreşger e.
b-Bawerê dilovan gul çandin.
c-Gulistana rûken li nav baxçan bêzûr kom kir.
d- Pirtûka şîn ciwan bû.
e- Mirovê evîndar gerok in.

**9- Ji peyvên li jêr kîjan ne dariştî ye?**

a- Gundî
b- Mal
c-Hêvîdar
d-Dildar
e-Sozdar

# SALOX

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**Hevalên me <u>kedkar in</u>.**
**Ji ber wê xwendekarên me <u>jîr in</u>.**
**Dema ku di xebatekê de ked neyê dayîn, di wî karî de jîrîtî jî dernakeve.**
**Di bingeh de gul <u>sor e</u>**
**Lê gulên zer jî <u>hene.</u>**

## *DAXUYANÎ*

Di mijara jor ya we xwendî de, peyvên binê wan hatine xêzkirin salox in, her yek ji wan heyînek dayîne salox dan.

Ew peyvên ku pêveka dem û kes digirin û navekê didin salox dan, ji wan re **salox** tê gotin.

**TÊBÎNÎ:**

Salox weke karan hevokan sazdikin.

Salox, li gor karanîna xwe wiha rêz dibin:

**a-Saloxên ji nav û pêveka dem pêktên:**

**Mînak:**

Bêrîvan Amedî bû.

Hozan xwendekar e.

**b- Saloxên ji hevalnav û pêveka dem pêktên:**

**Mînak:**

Gul sor bû.

Xwendekar jîr e.

**c-Saloxên ji hevalkar û pêveka dem pêktên:**

**Mînak:**

Waneya me îro ye.

Ji lîstokê re zû ye.

**d- Saloxên ji cînav û pêveka dem pêktên:**

**Mînak:**

Şervanê me ye.

Ev penûs ya min e.

**e- Saloxên ji dû navan pêktên:**

**Mînak:**

Cegerxwîn welatparêz bû.

Kurd Zerdeştî bûn.

**f-Saloxên ji nav û hevalnavekê pêktên:**

**Mînak:**

Rêber dilbirîn e.

Rêzan rûgeş bû.

Têkoşîn çavreş e.

**g-Saloxên ji du hevalnavan pêktên:**

**Mînak:**

Ala me keskesor e.

Ga reşbelek e.

**h-Saloxên ji du hevalkaran pêktên:**

**Mînak:**

Heval berjêr bûn.

Rêber berjor e.

**i-Saloxên ji palvedariya navan pêktên:**

**Mînak:**

Ev gula çiyê ye.

Palvedariya navan

**î- Saloxên Ji raveka hevalnavan pêktên:**

**Mînak:**

Ew gula sor e.

salox

## LÊKOLÎN

**1-Di kîjan vebijêrkên jêr de salox heye?**

a. Egîd çû çiyê.
b. Gula sor reng dide xakê.
c. Ev gulek bêhn xweş e.
d. Marmasî weke masiyan tevdigerin.
e-Heval Viyan waneyê dide.

**2-Di kîjan vebijêrkên jêr de salox ji nav çêbûye?**

a-Av germ e.
b-Zivistan sar e.
c-Gul xweşik e.
d-Hogir mamoste ye.
e-Hinar şîrîn e.

**3-Di kîjan vebijêrkên jêr de peyva dibe salox dariştîbûna wê ji yên din cuda ye?**

a-Sosin bêrîvan e.
b-Reşo gavan e.
c-Gelî xwendevan e.
d-Silo solbend e.
e-Dara aşvan e.

**4-Di kîjan vebijêrkên jêr de ji yekê zêdetir hevalnav bûne salox?**

a-Havîn germ e.
b-Pelê darê şîn in.
c-Serkeftin bi berxwedanê çêdibe.
d-Gul, sor û bi bêhn e.
e-Azad zana ye.

**5-Di kîjan vebijêrkên jêr de salox ji raveka hevalnavan pêkhatiye?**

a-Bahoz şoreşger e.
b-Manî  baş e.
c-Neyar bêwijdan e.
d-Ev deşta fireh e.
e-Ev dara çiyê ye.

## CÎNAV

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

***Hûn ji beriya niha fêr bûbûn ku peyva nav heyînan pêşwazî dike. Nav, di pêvajoya peyvinê de bi taybet navên kesan di her cûrî de tê diyarkirin.***
***Zîlanê digerim. Zîlan niha li vê derê bû. Zîlan çû li kûderê?***
***Hûn li cihê navê xwe kîjan peyvan bikartinin?***
***Çi <u>yên</u> <u>me</u> hebû ji <u>yên</u> <u>wan</u> cudatir?***
***<u>Ya</u> <u>kê</u> bû, ev pirtûk?***
***Dema <u>ew</u> çûyî geştê, li rastî <u>wan</u> hatibûn.***
***Dema em hevokên jor temaşe dikin, dibînin ku peyvên binê wan hatine xêzkirin, "yên, me, wan, ya, kê, ew" cihê kîjan navan girtine?***
***Hûn dikarin van ji hevokan derbêxin, hin navên din bikarbînin.***

DAXUYANÎ

## a-Di Nav Hevokê De Erkê Cînavan

Di van hevokên jor de peyvên "me, wan" cînav in, ji ber ku ev peyv cihê heyînekê yan jî çend heyînan hatiye bikaranîn.

Weke di mînakan de jî hatî dîtin, ev peyvên ku cihê heyînekê digirin jê re **cînav** tê gotin.

Ji ber ku cînav li cihê navan tê bikaranîn, weke navan tên nirxandin.

**Mînak:**

Min temaşeyî waneyê kir.
Ez diçim dibistanê.
Tû hatî mal.
Te wêne nivîsî?
Ew gula sor e.
Wê nivisîn, nivîsî.
We gul çandin?
Hozan, ew perwerde kirin.
Wan nan xwarin.
Li jor peyvên binê van hatine xêzkirin, bi baldarî bixwînin.
**Min**: Peyvek xwerû ye û kirek e.
**Ez**: Peyvek xwerû ye û kirek e.
**Tû**: Peyvek xwerû ye û kirek e.
**Te**: Peyvek xwerû ye û kirek e.
**Ew**: Peyvek xwerû ye û despêk e.
**Wê**: Peyvek xwerû ye û kirek e.
**We**: Peyvek xwerû ye û kirek e.

**Ew**: Peyvek xwerû ye û têrker e.
**Wan**: Peyvek xwerû ye û kirek e.

Birepeyvên ku ji nav û cînavekê pêktên, dibin palvedariya navan.

**Mînak:**

Pênûsa min, ciwantir e ji pênûsa te.

Divê hevokê de cînav, cihê nav girtiye û bi peyva "**pênûs"** re bûye palvedariya nav.

**TÊBÎNÎ:**

Di zimanê Kurdî de, cînavên kesî û cînavên nîşandanê nabin palvedar, her tim dibin palvedêr.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

***Peyvên di hevokên jêr de binê hatine xêzkirin, bi baldarî bixwînin.***

***Wan** pirtûk nivisîn.*

***Min** gul dîtin.*

***Me** **ew** dît.*

## *DAXUYANÎ*

## B-CÛRÊ CÎNAVAN

Dema em temaşeyî hevokên jor dikin, dibînin ku peyvên "wan, min, me, ew" li cihên navên kesan hatine bikaranîn.

Ew peyvên ku di mijarekê de yan jî di hevokekê de cihê nav tên bikaranîn û erkê navê kesekê digirin ser xwe jê re **cînavên kesî** tê gotin.

### Cûrên Cînavên Kesî

Cînavên kesî li gor karanîna xwe dibin du beş:

**a-Cînavên Kesî Yên ne tewandî**

Ew cînavên kesî yên ku netewandî û bi awayeke xwerû cihê navên kes digirin re **cînavên kesî yên ne tewandî** tê gotin.

**Mînak:**

Tu pirtûkê dixwînî?

Em çûn dibistanê.

Cînavên kesî yên xwerû, li gor jimara xwe dibin dû beş:

### 1-Cînavên Kesî Yên ne tewandî Yên Yekjimar

Ev cûrên cînavan, cihê navê kesê yekem, duwem û sêyem yên kit tên bikaranîn.

**Mînak:**

Ez diçim dibistanê.

Tu diçî dibistanê.

Ew diçe dibistanê.

### 2-Cînavên Kesî Yên ne tewandî Yên Pirjimar

Ev cûrên cînavan, cihê navê kesê yekem, duwem û sêyem yên kom tên bikaranîn.

**Mînak:**

Em diçin Qamişlo.

Hûn diçin Mehabadê.

Ew diçin Amedê.

### 1-Cînavên Kesî Yên Tewandî Yên Yekjimar

Ev cûrên cînavan, cihê navê kesê yekem, duwem û sêyem yên kit tên bikaranîn.

**Mînak:**

Min nivîsîn, nivîsî.

Te sipasnameya xwe stand.

Wî av vexwar.

Wê dar anîn.

### 2-Cînavên Kesî Yên Tewandî Yên Pirjimar

Ev cûrên cînavan, cihê navê kesê yekem, duwem û sêyem yên kom tên bikaranîn.

**Mînak:**

Me avjenî kir.
We derdor paqij kir.
Wan şitilên dara hinarê çandin.

## Taybetmendiyên Cînavên Kesî

-Cînavê "**ez**" di her sê deman de tê bikaranîn lê "**min**" ji bo dema borî tê bikaranîn.

-Cînavê "**tu**" ji bo her sê deman û cînavê "**te**" ji bo dema borî tê bikaranîn.

-Cînavê "**wî/ê**" ji bo dema borî , cînavê "**ew**" ji bo her sê deman tê bikaranîn.

-Cînava "**em**" ji bo her sê deman, cînavê "**me**" ji bo dema borî tê bikaranîn.

-Cînavê "**hûn**"ji bo her sê deman, cînava "**we**" ji bo dema borî tê bikaranîn.

-Cînavê "**ew**" ji bo her sê deman, cînavê "**wan**" ji bo dema borî tê bikaranîn.

Ji bo rêzgirtinê carna li cihê "**min-me**" û li cihê **"te-we"** tê bikaranîn.

**Mînak:**

Me jiyê xwe derbaz kir. Lê hûnê me jibîr nekin. Li vê derê her çiqas kesê daxive kesek tenê ye jî lê şûna **"min"** peyva **"me"** bikaraniye û dilnizmbûna xwe daye diyarkirin. Di şûna **"tu"** peyva **"hûn"** bikaraniye. Vê derê rêzdarî daye diyarkirin.

## 2-Cînavên Nîsandanê

<u>Ev</u> diçe dibistanê.
<u>Ew</u> pir pîr bû.
<u>Wan</u> pirtûk anibûn.
<u>Van</u> çi gotibû?
<u>Vî</u> name nivîsîbû.
<u>Vê</u> dariştin xwendibû.

Dema em temaşeyî hevokên li jor dikin, dibînin ku peyvên binê wan hatine xêzkirin, cînavên nîşandanê ne. Ji ber ku li cihê navekê hatine bikaranîn û dane nîşandan.

**Mînak:**

| | Cînavên Nîşandanê Nêzîk nêr û mê | Cînavên Nîşandanê Dûr Nêr û mê | Cînavên Nîşandanê Zayenda Nêr | | Cînavên Nîşandanê Zayenda Mê | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | **Nêzîk** | **Dur** | **Nêzîk** | **Dur** |
| **Kesê yekjimar** | Ev | Ew | Vî | Wî | Vê | Wê |
| **Kesê pirjimar** | Van | Wan | | | | |

***Şiyarî:***

**Berî em fêr bûbûn ku cînavên nîşandanê yên li jor, hevalnavên nîşandanê ji heman peyvan pêktên. Ji ber dema ev bi heyînekê re tên, wan heyînan nîşa dikin. Hevalnavên nîşandanê: "Ev gul sor bû." Ji ber ku peyva "ev" bi "gulê" re hatiye û daye nîşandan, hevalnavê nîşandanê ye. Dema li gel nav neyê bikaranîn û bi serê xwe di nava hevokê de erk bigire, di vê rewşê de dibe cînavê nîşandanê.**

**TÊBÎNÎ:**

Carnan di zimanê me de, peyvên weke "**he yê din, yê he, ya he**" ji bo cînavên nîşandanê dibin alîkar û nîşandanê sazûman dikin.

**Mînak:**

Tû wê ya he dibînî?

Tû wî yê he dibînî?

## 3- Cînavên Nediyar

Di zimanê Kurdî de, peyv û birepeyvên ku dibin cînavên nediyar pir in.

Ew peyvên hem di hêla jimar de hem jî di hêla nenasîbûnê de nediyare ku cihê nav digirin jê re **cînavên nediyar** tên gotin.

Hinek cînavên nediyar wiha ne: Pir, zêde, hinek, hin, hindek, gelek, kêm, kêmek, zor û hwd.

**Mînak:**

Pir: Em çûn geştê lê **pir** ne hatibûn.

Zêde: Ji bo xebatê **zêde** nehatibûn.

Çend: Xwendekar ezmûn bûn lê **çend** nehatibûn.

Hinek: Di Rojhilata Navîn de aştî pêşdikeve lê **hinek** nahêlin pêk bê.

Gelek: Me pirtûk nivîsî lê **Gelek** ma**.**

## 4-Cînavên Jimarî

Ew peyvên jimarî yên ku şûna heyîna di hêla jimarê de digirin, ji wan re **cînavên jimarî** tê gotin.

**Mînak:**

Me nûçe  şopandin **çar** şehîdin.

Em çûn dibistanê lê **pênc** nehatibûn.

Wî **<u>ji çaran yek</u>** xwendibû.

Ez çûm refê, min temaşe kir di refê de**, <u>sê sê</u>** rûniştibûn.

### Pêşdariya cînavên jîmarî

| Cînavên Jimara xwerû | Cînavên Jimara Rêzê | Cînavên Jimara Kertî |
|---|---|---|
| **Sêyan name xwend.** | Duwemîn pirtûk xwend. | **Ji çaran du hatin.** |
| **Dehan nivîsîn.** | **Şeşmîn çû waneyê.** | **Yek tam ji duyan yek çû.** |

## 5-Cînava Vegerok

Ew cînavên ku ji peyvek dubare pêktê û cihê heyînan digirin re **cînavên vegerok** tê gotin.

**Mînak:**

<u>Xwe bi xwe</u> çû dibistanê.

Dilbirîn <u>xwe bi xwe</u> çû dibistanê.

Dema em temaşeyî hevoka yekem dikin "**xwe xwe**" li cihê navê hatiye bikaranîn. Hevoka duwem jî "Dilbirîn" bi xwe hatiye bikaranîn.

## 6-Cînavên Pirsyarî

Cînavên pirsyarî, ji peyvên pirsyarî pêktên û heyînan dipirsin.

**Mînak:**

**Kîjan**: Kîjan nehatibû dibistanê?

**Çend**: Çend çûbûn zaningehê?

**Kî**: Kî hatiye?

**Kê**: Kê xwar?

Weke di mînakên jor de jî tê dîtin, peyvên ku bi awayekî pirsyarî cihê heyînan digirin re **cînavên pirsyarî** tê gotin.

## LÊKOLÎN

**1-Di parçeya jêr de peyvên binê wan hatine xêzkirin, kîjan ne cînavên kesî ne?**

Di cîhanek bextewar de ji bo aramiyê ; ez, em, ew, hûn û her kes berpirsyar e.

**a-**Ez **b-**Em **c-**Hûn **d-**Her kes **e-**Ew

**2-Di hevokên jêr de peyvên binê wan hatine xêzkirin, kîjan cînavên ne diyar e?**

-Hindek pênûs sor bûn.
-Çend kesan pirtûk xwend.
-Hinek çûn dibistanê.
-Hemû xwendekar çûn dibistanê.
-Kî hat baxçe?

**a-**Hindek **b-**Çend **c-**Hinek **d-**Hemû **e-**Kî

**3-Di kîjan vebijarkên jêr de cînavên nediyar nîne?**

a-Hindekan li gel wê peyvî?
b- Hinek li vê derê rastî me hatin.
c-Dildar çû geştê.
d-Hin çûn geştê.
e-Çend çûn male.

**4-Di hevokên jêr de, peyvên binê wan hatine xêzkirin, kîjan cînavên pirsyarî ne?**

a-Çend xwendekar çûn?
b-Kî heval hat?
c-Kê got?
d-Kîjan sêv sor bû?
e-Kîjan xwendekar hatiye?

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

***Hûn dikarin her demî beşkirina, nav, cînav, hevalnavan û hevalkaran di nav hevokan de kifş bikin.***
***Awa, dem, cih û çendiniya karê hûn dikin, hûnê çawa bidin diyarkirin?***
***Eger pirs ji rengê kirina karekî bê kirin, hûnê çawa bersiv bidin?***

## 4-Hevalkar

### a-Beşên Hevalkaran

Mijara jêr bi baldarî bixwînin bersiva pirsên kar li kûderê, kengê û çawa hatiye kirin, bersiv bidin?

Îro 15'ê Tebaxê ye, hevalên me yên çandê, pir dixebitin, bi xebatên çandê ve tevayî şeva xwe borandine.

Hêviya me heye ku şahiya 15'ê Tebaxê pir baş derbaz bibe, şahî wê li pêşiya saziya çandê pêk were. Gel di demjimêra hivdehan de kom dibe. Lê şahî wê di hejdehan de destpêbike, wê gelek kes ji derve jî tevlî şahiyê bibin.

Deme em temeşeyê benda jor dikin, dibînin ku peyvên binê wan hatine xêzkirin, bersiva pirsên kirin, çawa, kengê û li kûderê têkirin, didin.

Ew peyvên ku karan di hêla dem, rewş, cih û ber, çendinî û pirsyarî de didin temamkirin re **hevalkar** tê gotin.

Wekî di mijara jor de jî tê dîtin, peyvên weke "**pir, tevayî şeva xwe, pir baş**, di demjimêra hevdehan de û di hijdehan de" hevalkar in.

Di bingeh de hevalkar her çiqas, hevalkar nav jî be lê dema ku li rex kar û saloxan tê bikaranîn dem, cih û awa û qasiyan wan didin diyarkirin.

Hevalkar li gor karanîna xwe dibin pênc beş:

## 1-Hevalkarên Cih û Ber

Peyvên ku bersiva pirsa li kû, li kûderê û ji kû ve dema tên dayîn dibin hevalkarên cih û ber.

**Mînak:**

Dema ez dîtim **berjor** çû.

Xwedekar **berjêr** hatin.

Xemgîn **paş paş** çû.

Peyvên di hevokên jor de reş hatine nivîsîn, hevalkarên cih û ber in.

Jo peyvên ku cih û berê kar û saloxê didin diyarkirin re **hevalkarên cih û ber** tê gotin.

**TÊBÎNÎ:**

Peyvên ku ji bo hevalkarên cih û ber tên bikaranîn ev in:

| | |
|---|---|
| Jêr | Jor |
| Pêş | Paş |
| Çep | Rast |
| Hûndir | Derve |
| Bakur | Başur |
| Rojihat | Rojava |

## 2- Hevalkarên demî

Peyvên  ku dema karî didin diyarkirin pir in. Peyvên dibin bersiva pirsa "**kengê, çi dem**" ji wan peyv û birepeyvan re **hevalkarên demî** tê gotin.

**Mînak:**

-Baran**, êvarî** tê dibistanê?

-Zarok, **roja cejnê** şahiyê dikin?

-Egîd, **di demjimêra çarê de**, tê dibistanê?

-Xwendekar**, bi şev** li ser waneyên xwe dixebitin?

Dema em temaşeyî hevokên jor dikin, peyv û birepeyvên bînê wan hatine xêzkirin, hevalkarên demî ne, ji ber dema kar dayîne diyarkirin.

Peyvên ku dema kar û saloxê diyar dikin re **hevalkarên demî** tê gotin.

## 3-Hevalkarên Rewsî

Hevalkarên rewşî, ew peyv û birepeyvên ku rewşa kirina kar didin diyar kirin û dibin bersiva pirsa **"çawa**" jê re **hevalkarên rewşî** tê gotin.

**Mînak:**

Hozan û nivîskar, nivîsîna xweşik **bi lez** nivîsîn.

Xebata bê rêkûpêk **vala** diçe.

Ew ji Amûdê **hêdî hêdî** hat.

Dema temaşeyî hevokên jor dikin, peyv û birepeyvên hatine dest nîşandan hevalkarên rewşî ne.

Peyv û birepeyvên rewşa kirina kar didin diyarkirin jê re **hevalkarên rewşî** tê gotin.

## 4-Hevalkarên Cendinî

Ez ji gulê **pir** hezdikim.
Berçemê, nivîsîn **gelek** xwend.
Kulîlka sor**, zor** ciwan bû.
Dilşêr **kêm** tê dibistanê.

Peyv û birepeyvên li jor binê wan hatine xêzkirin, hevalkarên çendinî ne. Ji ber ku qasiya kar û saloxê dayîne diyar kirin, hevalkarên çendinî ne.

Weke di van mînakên jor de tê dîtin, di hêla qasiyê de kar û saloxê bandor dikin re **hevalkarên çendinî** tê gotin.

## 5-Hevalkarên Pirsyarî

Ev cûre hevalkar, di hêla pirsyarî de, kar û saloxan temam dikin jê re **hevalkarên pirsyarî** tê gotin.

Hevalkarên pirsyarî, peyvên pirsyarî yên ku ji bo peydakirina cûrên din yên hevalkaran tên bikaranîn, digire nav xwe.

**Mînak:**

Ez li wê riyê re **çawa** derbaz bûm?
Hûn **kengê** çûn?
Mazlum **ji kû ve** hat?
We **çiqas** anî?

## LÊKOLÎN

**1- Di mijara jêr de, peyvên hatine nîşandan, ji kîjan vebijarkên li jêre?**

*"Biharek nû xweş vebûye*
*Dilê yarê pir şabû ye*
*Riya azadiyê wê diye*
*Evîndarek li bendê ye*
*Ji ber wê îro rêwî ye."*

a-Hevalkarên rewşî, hevalkarên pirsyarî, hevalkarên demî
b-Hevalkarên rewşî, hevalkarên cih û ber, hevalkarên demî
c-Hevalkarên çendinî, hevalkarên pirsyarî, hevalkarên demî
d-Hevalkarên rewşî, hevalkarên çendinî, hevalkarên demî
e-Hevalkarên rewşî, hevalkarên pirsyarî, hevalkarên çendinî

**2-Peyva "xweş" di kîjan vebijarkên jêr de, weke hevalkar hatiye bikaranîn?**

a-Karên xweş, rûyê xwediyê xwe dikenîne.
b-Xweşî, ji her tiştî baştir e.
c-Xatûnê axaftinek xweş kir.
d-Gul, xweşik vebû.
e-Hevaltî pir xweş e.

**3-Di kîjan vebijarkên jêr de, hevalkarê cih û ber heye?**

a-Karker di heşt demjimêran de dixebite?
b-Zivistanê baran pir dibare.
c-Wan ji bo bersivdayîna neyaran çar salan xebat kirin.
d-Hîvîdar berjor bezî.
e-Şer li Rojavayê Kurdistanê berdewam e.

**4- Di hevoka jêr de, kîjan cûrepeyv, nayê dîtin?**
**"Min ew pirtûk zû girt û xwend"**

a-Cînav b-Hevalkar c-Hevalnav
d-Nav e-Salox

**5-Hevalkarên di vebijarkên jêr de, kîjan dibe bersiva peyva pirsyarî ya "çawa"?**

a-Viyanê, pirtûk delal xwend.
b-Rojînê, kar gelek kir.
c-Lîlozê, name çawa nivîsî?
d-Demhat, danê êvarê berjor çû.
e-Rûken, îro çû dibistanê.

**6-Di kîjan vebijarkên jêr de, hevalkarên çendinî hatiye bikaranîn?**

a-Gelek heval çûn kar.
b-Tu dikarî hindek şekir bêxî vê çayê?
c-Rohat, çend pênûs anîn?
d-Nûhat, name gelek nivîsîn.
e-Rêdûr, nivîsîna xweşik nivîsî.

**7-Di kîjan hevokên jêr de, hevalkarên rewşî heye?**

a-Nûjîn hêdî hêdî çû.
b-Rêber, êvarê ji Hewlêr hat.
c-Sîpan, kengê ji Hewlêr hat?
d-Kanî, ji banî hat xwar.
e-Gulistanê, gul zor anîn.

**8-Di vebijarkên jêr de, peyvên binê wan hatine xêzkirin, kîjan li gor cûrên din cudatir e?**

a-Sosinê, pênûs gelek anîn.
b-Baran, pênûs gelektir anîn.
c-Berçemê, jêbir gelektirîn anîn.
d-Hêviyê, pirtûk hêj pirtir anîn.
e-Hêlînê, gul ciwan çinîn.

**DAXUYANÎ**

Dema xwendekaran pirtûkên xwe bilezginî dixwendin, gelek şaşî dikirin. Ji bo wan şaşiyên xwe sererast bikin, roja piştî wê xwendina xwe hêdî hêdî didan domandin.

## B-ÇÊBÛNA HEVALKARAN

Hûn dizanin ji bo mirov hevalkaran bibînin, peyvên pirsyarî yên **çawa, kengê, li kûderê û çiqas** tên pirskirin. Hevalkarên di benda jor de derbaz bûyîn û binê wan hatine xêzkirin, li gor çêbûnê, lêkolîn bikin. Hindek di rewşa kokê de ne, hinek ji wan pêvekên sazker standine û hindek jî ji dû peyvên hevgirtî bi hev re pêkhatine û kar dayîne temamkirin.

Ji ber wê çendê hevalkar li gor çêbûna xwe dibin sê beş:

### 1-Hevalkarên Xwerû

Ew hevalkarên ku pêvekek sazker nestandî û hevgirtin bi peyvek din re çênekirî û bi awayekî xwerû kar dayîn temamkirin re **hevalkarên xwerû** tê gotin.

**Mînak:**

Em par çûn dibistanê.
Wan pirtûk xweş xwend.
Wan gul pir çandin.
Ew ji jor ve hatin.
Wan çawa xwend?

## 2-Hevalkarên Darîştî

Hevalkarên xwerû yên ku pêvekek sazker standî û wateyeke nû dayîn qezenckirin û bi wê wateya nû kar dayîn temamkirin re **hevalkarên darîştî** tê gotin.

**Mînak:**

Zîlanê, pirtûk bievîndarî xwend.
Hevalkar

Şîlanê, gul bidildarî çand.
Hevalkar

## 3-Hevalkarên Hevgirtî

Hevalkarên hevgirtî; ji hevgirtina dû yan ji zêdetir peyvan pêk tên.

Mînak:

Dilawer çeprast nivisî.
Hêja berjêr çû.
Solînê bi lezûbez xwend.
Dibe ku carna hevalkar ji birepeyvan pêkwerin.

**Mînak:**

Ew hêdî hêdî meşiyan.
Wan pirtûk xweş û rêkûpêk xwendin.
Dibe ku hevalkar li gel alavan, birepeyvan sazbike.

**Mînak:**

Hogir, bi lez çû.
Nalîn, di şevê de çû.
Ew ji kû ve hat.

## LÊKOLÎN

**1-Xwendekarên me waneyên xwe dubare dubare dinivîsînin û pêş dikevin, bi vê re kêmasiyên xwe jî yekbiyek radikin. Di kîjan hevokên jêr de peyvên weke dubare dubare û yekbiyek di heman erkî de tê bikaranîn, hene?**

a-Dubare dubare pirtûk bala mirovan dikişînin.
b-Yekbiyek xwendekar çûn dibistanê.
c-Me yekbiyek pirtûk danîn ser mêze.
d-Mamostayên me kêmasiyên xwe yekbiyek anîn ziman.
e-Gulên rengbireng welatê me xweş dikin.

**2-Di kîjan vebijêrkên jêr de peyva hevgirtî hevalkar e?**

a-Cegerxwîn, nivîskarekî Kurd e.
b-Rewşenbîrên Kurdan, dilbirîn in.
c-Ehmedê çavreş, rojnamevan e.
d-Daristanên rengbireng Kurdistanê dixemilînin.
e-Hogir, bidilşadî çû ser dijmin.

**3-Di kîjan vebijêrkên jêr de hevalkarên xwerû hene?**

a-Heval bilezûbez çûn çiyê.
b-Xwendekar refbiref dimeşin.
c-Deryayên mezin li derdora cîhanê pir in.
d-Bihar xweş hat.
e-Havîna Erebîstanê dirêj e.

**4-Kîjan hevalkara vebijêrkên jêr, li gor çêbûna xwe ji yên din cuda ye?**

a-Egîd bi evindarî diçû şer.
b-Hogir xweş hat.
c-Ji bo xebatê, êvarê çûn.
d-Mirov beyanî radibin.
e-Kesên mezin, baş tên dîtin.

**5-Di kîjan vebijêrkên jêr de, hevalkar nînin?**

a-Nivîskar, bilez dinivîsin.
b-Zanyar, baş dihizirin.
c-Nivîskarên nemir ji me re pirtûk gelek nivîsin.
d-Kesên baş, kar nekin ser nakevin.
e-Robar pir xweş diherikin.

# BEŞA 3.

## PEYVÊN ALAVÎ

### Alav

DAXUYANÎ

**Waneyên ji beriya niha, em li ser peyvên bi wate rawestayîbûn. Dema peyvên bi wate tên gotin tiştek, bîranînek, karek, taybetmendiyek, çêbûnek û tevgerek tê bîra mirov. Ev jî weke nav, cînav, hevalnav û hevalkar hatine bikaranîn.**
**Niha jî bibaldarî mînakên jêr bixwînin. Ji bo bersivdana pirsan hewl bidin.**
**Ax dilo! Tû çima ew qas bê exbalî?**
**Di hevoka li jor de peyva "ax" bi peyva “dilo” re birên bangî pêkanî ye.**
**Wey dayê! Heya kengê emê bindest *bin.***
***Ay! We dît.***
***Di gel van hevokasn jî mirov dokare erkê peyvên bangî bibîne. Dîsa erkê alavên daçekî, gihanek , ... di nava hevokan de bibîne. Her wiha di gel navan çawa dibin xwedî wate emê bibînîn.***

# CÛRÊN ALAVAN

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-Dema hûn destê xwe bibirin yan jî, destê we li tiştên hişk bikeve, hûn bi tirs û êşandinê re çi dibêjin?**
**2-Li hemberî bûyerekî ku we bêşîne yan xemgîn bike, hûn çi peyvê bikartînin?**
**3-Li hemberî bûyerek we dilşad bike, hûn bi çi peyvan hestên xwe tînin ziman?**
**4-We balkêşa ye! Ji bo bangkirin û danîna (gazîkirina) tebayan, kîjan peyv tên bikaranîn. Hûn çawa banî se, pez, pisîk, mirîsk û dewaran dikin?**
**Li dawiya van peyvan hêmaya baneşan tên bikaranîn. Hûn wateya wê hêmayê dizanin?**

## *DAXUYANÎ*

Di zimznê Kurdî de peyvên weke "**dayê, ay, wey, ax, hewar** e" ji bo balê bikişîninli ser tiştekî tên bikaranîn.

Dema em dibêjin "**dayê"** em dibînin kû peyva **"dayê"** pêveka bangî **"ê"** girtiye, ji bo bangkirinê hatiye bikaranîn.

Dema ku em van peyvan yekbiyek bikartînin ti wateyê nadin. Ev li gor cihên lê tên bikaranîn hestekî diyar dikin.

Peyvên ku bi serê xwe wate nadin lê ji bo heskirin, bêzarî, xuruş, tirs û êşandinê tên bikaranîn û li hemberî wan hestên

mirovan dixin tevgerê ji wan re **alavên bangî** tên gotin. Li ser peyvên bangî baneşan (!) tê bikaranîn.

## 1- ALAVÊN BANGÎ

### a-Alavên bangî, dibe ku dubare bên bikaranîn.

**Mînak:**

Bêmal, derket ser banê xanî û bang dike: Hewar e hewar e! Gundîno! Neyaran talanê me birin.

### b-Cûrên Bangan

Di zimanê Kurdî de, peyvên bangî di sê beşan de tên bidestgirtin.

### 1-Peyvên Rasterast Bang

Ji bo ku mijar dirêj nebe, heya ji me bê em ê ji dubarekirina peyvan birevin. Ji bo ku em bi awayekî kurt van peyvan nîşabikin, em ê binê peyvên bangî xêz bikin û kîjan peyv ji bo çi hatine bikaranîn emê binivîsînin.

**Mînak:**

Ax: Ji bo hatina xweşî û nexweşî tê bikaranîn.
Of: Ji bo pêhesîna bêzarbûn û nexweşiyekî tê bikaranîn.
Wax: Ji bo hestên mixabinbûnê tên bikaranîn.
Wey: Ji bo hestên bêzarbûnê bidin diyarkirin tên bikaranîn.
Wa: Ji bo bankirina hest nîşa bike tên bikaranîn.

### 2-Peyvên Ku Dibin Bang

Ev di rastiyê de, nepeyvên bangîne lê belê di cihên karanînê de dibin peyvên bangî.

**Mînak:**

Tu bixudê kî! Were vê derê.
Ha! Wê pirtûkê bîne.
Mala Xudê ava! Tû hatî.

### 3- Peyvên Ku Pêhesînê Çêdikin

Ew peyvên ku ji dengê teba û xwezayê tên girtin yan jî bi wan peyvan banî tebayan dikin.

#### a- Dengê Teba û Xweza

Mêe…, hev hev, hoo..., miyev, zirr.

#### b-Dengê Teba Pê Tên Bangkirin

Şûş! Çû! Kişe! Yih! gido gido! Dire! Wihe! Wişe!

## 2- ALAVÊN GIHANEK

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Serê dû benan bi hev ve tê girêdan, dû parçeyê kaxezan bi hev ve tê zeliqandin. Diravê qetiyayî bi bandê (lezaqê) em bi hev ve dikin. Pelgeyê kargehekê bi derziyan bi hev ve dikin.**

**Di zimanê Kurdî de, ji peyvên bi vî awayî, peyvan û hevokan bi hev ve girê dide hene. Di ferhengan de, li vê mijarê bigerin, agahiyan bigirin.**

**Dinya pêlê evîn im:**

**Canê xwe derîne tû ji pişta çeperê perdê hilîne ku li min roj bi derê, şevreş bike ronî bi loks û fenerê macek ji dû lêvan bide, ey! Lêv şekirê. Ew e dermanê birînê û kul û derd û kederê.**

**2- Di benda jor de peyva "ku, û" di navbera kîjan peyv û hevokan de girêdanê çêdikin. Dema em van peyvan ji nivîsinê rabikin, di hêla wateyê de xirabûnekî çêdibin? Ji bo hûn vê têbigihin "ku-û" ji nivîsînê rabikin û wisan bixwînin.**

### a- Erkên Alavên Gihanek

Peyvên **"ku-û"** yên ku di mijara jor de derbasbûyî, dema em ji navbera peyv û hevokan rakin, zêde wateya wan xira nake, lê belê bi rakirina wan re girêdana wan bi hev re nayê çêkirin. Bi vî awayî têkîliyên wan yên di hêla wateyê de bi hev re lewaz dibin, ji bo têkîliyên di navbera wan de xurt bibin, tên bikaranîn.

**Mînak:**

Gihaneka "**û**"

Hizirîn **û** qîr li hev nayên.
Gihaneka "**ku**"
Şerê **ku** ji bo azadiyê tê kirin pîroz e.
Gihaneka "**jî**"
Ez çûm dibistanê, ew **jî** hatîbû.
Gihaneka "**lê**" (lê belê)
Me wane nivîsî lê baş ne hat nivîsîn.
Gihaneka "**yan**"
Yan serkeftin yan serkeftin.
Gihaneka "**hem**"
Hem dize hem daberize.
Her du mînakên dawî carnan dubare tên bikaranîn.

## 3-ALAVÊN

Di hevokên bûyerên mercî de tên bikaranîn.
**Mînak:**
Ger were, ez jî wê bêm.
Heya neyê, ez nayêm.

## 4-Alavên SEDEMÎ

Di hevokên boneyî yan jî bûyerekî sedemî de têgihandina wê di hevokê de çêdike.
**Mînak:**
Ji ber ku rêkûpêkiya kar nehatibû çêkirin, kar nehatiye domandin.
Jibo kû em biser bikevîn, divê tekoşînê bikin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**Di waneyên borî de em fêr bûbûn ku alav peyvên amraz in. Ew alavên du peyvên di heman erkî de yan hevokên di heman erkî de bihev ve girêdidin, ji wan re alavên gihanek (girêdanê) tên gotin. Niha jî peyvên binê wan hatine xêzkirin yên di mijara jêr de bi baldarî bixwînin.**

***DAXUYANÎ***

**CÛDÎ**

**Şev di xew de min xwe dît, li deştekî her çar aliyên wê biçiyan pêçayî, li milê bakur Çiyayê Cûdî, biqama xwe serbilind, ez binavê Nûh li tiştekê windayî digeriyam. Li hêlînekê, li kevokekê, li weşiyê genim digeriyam û her digeriyam heya westiyam û bi xew ve çûm.**

**Li vir peyvên weke "di-de-li-bi-ve" erkek çawa girtine? Ev li kîjan milê nav hatine bikaranîn? Bê ku bên bikaranîn em dikarin hizir û daxwazên xwe bînin ziman?**

## 5-Alavên Daçekî

Di mijara jor de, peyvên binê wan hatine xêzkirin, neyên bikaranîn wate li gor daxwaza me nayê pêşxistin.

Dema ku tu peyvên "**xew, deşt, milê başur, tiştekê, hêlînekê, kevokekê**" tenê bikartînî bêguman hevok wek tu dixwazî nayê sazkirin. Ji ber dibe ku wateyek tû naxwazî derdikeve holê. Ew alavên dikevin ser navan têdeyî, pêreyî, pêveyî, jêreyî yanî bi kurtahî alavên rewşa navan didin diyarkirin ji wan re **alavên daçekî** tê gotin. Piranî alavên daçekî, paşdaçekan digirin.

**Mînak:**

Ez di mal de rûniştibûm.
Ew ji wir ve hat.
Xwendekar bi mamostan re hatin.
Baranji Gulê re got: "Were."

Dema em temaşeyî mînakên jor dikin, dibînin ku peyvên binê wan hatine xêzkirin, alav ketine ser navan, rewşa navan ya têdeyî, alî, pêreyî, jêreyî dane diyarkirin. Bi navan re birepeyvên alavî dane sazkirin. Ev birepeyvên alavî carnan dibin palvedêr, carnan dibin salox û carnan jî dibin têrker.

**Têrker**

Mazlum di dibistanê de dinivîse.
*Têrker*

***Palvedêr:***

Gula li çiyê delal e.
**Palvedêr**


**Salox**

Heval di refê de ne.
*salox*

Di zimanê Kurdî de alavên daçekî ev in:
Di: Di welatê me de, dagirkeriya dijmin berdewam dike.
Ji: Bayê ji bakur ve tê hênik e.
Bi: Şivan bi zarokên xwe ve çûn bakur.
Li: Li Rojava şerê YPG'ê didome.

## LÊKOLÎN

### HEJAR



**1-Navê wi yê rasti dixtor Abdurahman şeref Qendî ye, di sala 1920'an de li bajarê Mehabadê ji dayîkbûye.**

Li gor gotina wî malbata wî nedewlemend bûye lê bavê wî mela bû. Di biçûkatiya xwe de, fêrî xwendinê bûye. Di serpêhatiya xwe de Hejar dinivîsîne.

Bavê min mela bû, ez hîn dikirim, gelek Xuda nas bû, ji min re digot:

"Ger dilê te tiştekê bixwaze, duan ji Xuda bike."

Di mijara jor de, peyvên binê wan hatine xêzkirin, kîjan weke alavên gihanek hatiye bikaranîn?

a-Li
b-lê
c-wî
d-di
e-bû

**2-Di kîjan vebijarkên jêr de alava "jî" wek gihanek hatiye bikaranîn?**

a-Jîrîtî bi kedê çêdibe.
b-Jinda, keçek ciwan e.
c-Jin û jiyan girêdayî hev in.
d-Em çûn bajêr xwendekar jî hatin.
e-Ji serxwebûn û azadiyê birûmetir tiştek nîne.

**3-Di kîjan vebijarkên jêr de peyva "lê" weke gihanek hatiye bikaranîn?**

a-Lê tu bê, ewê bê."
b-Lê tu bixebitî, ewê bi xebite.
c-Lê tu neyê, ew jî nayê.
d-Lêdana deng sazûmaniya axaftinê çêdike.
e-Em hatin lê ew nehatin.

**4-Di kîjan vebijarkên jêr de "ku" ya gihanek nehatiye bikaranîn?**

a-Ji ber ku hûn hatin ez nehatim.
b-Têkoşîna ku ji bo azadiyê tê dayîn, şahîyê li gel xwe dafirîne.
c-Dixwazim ew jî bê ku bixwîne.
d-Hêvîdar im ku hûn kefxweş bin.
e-Yê bixwînin rêber in.

**5-Di kîjan vebijarkên jêr de rewşek baneşanî heye?**

a-Ax lawê hêja tu çend ciwan bû.
b-Ger ew neyên, hûn neçin.
c-Ji ber nehatina hevalan kar nîvçe dimîne.
d-Hêvîdar im ku bi dilê we be.
e-Di malê de gelek kes hene.

**6-Di kîjan vebijarkên jêr de wateya xemginiyê heye?**

a-Wax! Gelek xweş bû.
b-Of! Hat.
c-Heya tu neyê, ew nayê.
d- Li gor min, rewş xweş e.
e-Hey wax! Felekê te çima li me wiha kir.

**7-Di kîjan vebijarkên jêr de rewşek mercî heye?**

a-Nêrgiz ji bo azadiyê kar nekir.
b-Hogir û Rewşen jî çûn malê.
c-Şerê ku ji bo azadiyê tê kirin pîroz e.

d-Ox, xweş! Bîra te kolayî tu bixwe ketiyî.
e-Heya ew neçin çiyê, kar rêve naçe.

**8- Di kîjan vebijarkên jêr de alav di rewşek cuda de hatiye bikaranîn?**

a-Wey! Çi darek e.
b-Ax! Li vir çi bêhn tê.
c-Ax, dilo! Tû çima ew qas bê exbalî.
d-Wey! Êdî naxwazim van çîrokan guhdar bikim.
e-Hem dize hem daberize.

**9-Di kîjan vebijarkên jêr de alavê rewşek ya têdeyî daye navan?**

a-Li Amedê hêzên desthilatdar dîsa êrîşî gel kirin.
b-Şêrwan ji Hewlêrê ve hat.
c-Ew bi hevalan re çû Efrînê.
d-Wan di bajêr de gotûbêjên xwe domandin.
e-Zozanê, ji mamoste re tiştek negot.

**10-Di kîjan vebijarkên jêr de alav ji yên din cudatir hatiye bikaranîn?**

a-Yan bixwîne yan binivîse.
b-Guhdar, pênûs û lênûs anî.
c-Pelşînê jî axaftinê xwe kirin.
d-Axaftinê wî hevalî hem zor in hem ji xweş in.
e-Mamoste li ser mêze goftûgokirin.

# BEŞA 4.

## DEM

Kar, li gor çêbûn, kar û tevgera xwe di deman de tê bikaranîn. Ji vî awayî re **dema kar** tê gotin. Kar li gorî daxwazê, pêvekên kesî û demî bi xwe ve digirin.

*Ew peyvên pêveka demî li pêş yan li dawiya wan ve tê zêdekirin yan ew bixwe dem diyar dikin jê re* ***rawe*** *tê gotin.*

**Di zimanê Kurdî de sê demên bingehîn hene.**

**1.** Dema niha
**2.** Dema bê
**3.** Dema borî

## 1- Dema niha

Di dema niha de, kar yan jî rewşên tên jiyankirin hîn dawî lê nehatî re **dema niha** tê gotin.

**Mînak:**

Ez pirtûkê dixwînim.
Kulîlkên dara behîvê geş in.

Di zimanê Kurdî de, dema pêveka dema niha û kesî li ser koka peyvê bê zêdekirin, kar yan jî saloxa dema niha sazdibe.

**Mînak:**

| Pêveka dema niha | Kok | Pêveka kesî | Kar û saloxên dema niha |
|---|---|---|---|
| Di | xwîn | im | Dixwînim |
| Di | nivîs | î | Dinivîsî |
| Di | lîz | e | Dilîze |
| | Sor | e | Sor e |
| | Geş | in | Geş in |

Ji jêdera **“xwendin”**

Dixwînim.
Dixwînî.
Dixwîne.
Dixwînin.
Dixwînin.
Dixwînin.

Ji jêdera **“birin”**

Dibim.
Dibî.
Dibe.
Dibin.
Dibin.
Dibi nerênî
Nabim.
Nabî.
Nabe.
Nabin.
Nabin.
Nabin.

| **Yekjimar** | **Pirjimar** |
|---|---|
| Ez dilerizim | Em dilerizin |
| Tu dilerizî | Hûn dilerizin. |
| Ew dilerize | Ew dilerizin |

**TÊBÎNÎ:**

Dema, pêveka nerênî "na" dikeve li ser karê dema niha, pêveka dem radibe û cihê wê pêveka nerênî erk distîne û kar dibe nerênî.

## 2-Dema bê

Di dema bê de, kar an jî rewş hîn nehatiye jiyankirin lê pêkanîna wê tê xiyalkirin, jê re **dema bê** tê gotin.

Di zimanê Kurdî de, karê dema bê hîn dest pê nekiriye lê wê di dema bê de, di pêşerojê de pêkbê. Pêveka dema bê "**wê, yê, ê**" ye.

Pêveka "**bi**" wekî pêveka erênî li ser pêşiya koka karî zêde dibe lê ew kar wê di dema pêş de bê kirin.

**Mînak:**

| Pêveka dema bê | Pêveka erênî | Kok | Pêveka kesî | Kar û saloxên dema bê |
|---|---|---|---|---|
| Wê | bi | xwîn | im | Wê bixwînim |
| Wê | bi | nivîs | î | Wê binivîsî |
| Wê | bi | nivîs | in | Wê binivîsin |
| Wê | | Sor | bin | Wê sor bin |
| Wê | | Geş | be | Wê geş be |

| Yekjimar | pirjimar |
|---|---|
| Ez ê bikujim | Em ê bikujin |
| Tû yê bikujî | Hûn ê bikujin |
| Ew ê bikuje | Ew ê bikujin |

| **Ji jêdera " çûyîn"** | **ji jêdera "xwarin"** |
|---|---|
| Wê biçim. | Wê bixwim. |
| Wê biçî. | Wê bixwî. |
| Wê biçe. | Wê bixwe. |
| Wê biçin. | Wê bixwin. |
| Wê biçin. | Wê bixwin. |
| Wê biçin. | Wê bixwin. |

**Jî jêdera " hatin"     Nerênî**

Wê neyêm.
Wê neyî.
Wê neyê.
Wê neyên.
Wê neyên.
Wê neyên.

**TÊBINÎ**

Dema, pêveka nerênî **"ne"** dikeve li ser karê dema bê, kar dibe nerênî.

## 3- Dema borî

Di dema borî de kar bi encam bûye. Kar yan jî rewş derbaz bûye. **Dema borî di nav xwe de dibe çar beş**.

**I.** Dema boriya nêzîk
**II.** Dema boriya berdest
**III.** Dema boriya çîrokî
**IV.** Dema boriya dûdar

### I-Dema boriya nêzîk

Di dema boriya nêzîk de hêj zêde dem di ser kirina kar re derbaz nebûye û nû hatiye kirin.

**Mînak:**

Min pirtûk xwend.

Di dema boriya nêzîk de, pêveka demê li ser koka pevyê nehatiye zêdekirin û kar bi awayê xwerû maye.

**Mînak:**

| *Yekjimar* | *pirjimar* |
|---|---|
| Ez ketim | Em ketin |
| Tu ketî | Hûn ketin |
| Ew ket | Ew ketin |

| *Yekjimar* | *pirjimar* |
|---|---|
| Min pirtûk xwend. | Me pirtûk xwend. |
| Te pirtûk xwend. | We pirtûk xwend. |
| Wê/î pirtûk xwend. | Wan pirtûk xwend. |

## II-Dema boriya berdest

Di dema boriya berdest de, kar di dema borî de pêk hatiye û kes bi xwe jî bînerê bûyerê ye, bandorê dema niha nake û bi hevokeke din re têkildar e.

Ev dem, ji pêveka dema niha "**di**" digire û karê dema boriya nêzîk pêktê.

**Mînak:**

Ji jêdra "**ketin**"

| | |
|---|---|
| Ez diketim. | Em diketin. |
| Tu diketî. | Hûn diketin. |
| Ew diket. | Ew diketin. |

Ji jêdera “ **nivîsîn”**

| | |
|---|---|
| Min name **dinivisî**. | Me name **dinivîsî**. |
| Te name **dinivisî**. | Wan name **dinivîsî.** |
| Wê/î name **dinivîsî**. | We name **dinivîsî.** |

Dema boriya berdest, pêveka nerênî "ne" distîne pêkhatina kar di warê nerênî de pêşwazî dike.

## nerênî

**Mînak:**

Nediketim.
Nediketî.
Nediket.
Nediketin.
Nediketin.
Nediketin.

## III-Dema boriya çîrokî

Di dema boriya çîrokî de; kar, bizav û bûyer di dirêjahiya dîrokê de çêbûye.

Ev dem, ji pêveka dema boriya çîrokî "**bû**" û karê dema boriya nêzîk pêktê.

**Mînak:**

| **Yekjimar** | **pirjimar** |
|---|---|
| Ketibûm | Ketibûn |
| Ketibûyî | Ketibûn |
| Ketibû | Ketibûn |

Ji jêdera “**xwarin”**

| | |
|---|---|
| Min tirî xwaribû. | Me tirî xwaribûn. |
| Te tirî xwaribû. | We tirî xwaribûn. |
| Wî/ê tirî xwaribû. | Wan tirî xwaribûn. |

Ji jêdera “**kolandin”**

| | |
|---|---|
| Min zevî kolabû. | Me zevî kolabûn. |
| Te zevî kolabû. | We zevî kolabûn. |
| Wî/ê zevî kolabû. | Wan zevî kolabûn. |

.

## IV-Dema boriya dûdar

Di dema boriya dûdar de kar pêkhatiye û demeke dirêj li ser kirina karê wê re derbaz bûye û bandora wê heta niha berdewam dike.

**Mînak:**

Ji jêdera "**ketin**"

| <u>**Yekjimar**</u> | <u>**Pirjimar**</u> |
|---|---|
| Ketime | Ketine |
| Ketiyî | Ketine |
| Ketiye | Ketine |

Ji jêdera "**dîtin**"

| | |
|---|---|
| Min dîtiye | Me dîtine |
| Te dîtiye | Wan dîtine |
| Wî/wê dîtiye | We dîtine |

Ev dem, ji pêveka dema boriya dûdar "**ye-e**" û karê dema boriya nêzîk pêktê.

Dema boriya dûdar, bi pêveka nerênî "ne" distîne pêkhatina kar di warê nerênî de pêşwazî dike.

**Mînak:**

Neşûştiye.
Neşûştiye.
Neşûştiye.
Neşûştine.
Neşûştine.
Neşûştine.

Têbînî: Karên kireka wan tewandî hevsengiyê bi pêkirê re çêdikin, yanî yekjimarbûn û pirjimarbûna wan li gorî pêkirê çêdibe.

| KES | Dema boriya nêzîk | Dema boriya çîrokî | Dema boriya berdest | Dema boriya dûdar |
|---|---|---|---|---|
| | Bê pêvek e | bû | Di | Ye –e |
| Kesê 1. yekjimar **Ez** | Hatim | Hatibûm | Dihatim | Hatime |
| Kesê 2. yekjimar **Tu** | Hatî | Hatibûyî | Dihatî | Hatiye |
| Kesê 3. yekjimar **Ew** | Hat | Hatibû | Dihat | Hatiye |
| Kesên 1. pirjimar **Em** | Hatin | Hatibûn | Dihatin | Hatine |
| Kesên 2. pirjimar **Hûn** | Hatin | Hatibûn | Dihatin | Hatine |
| Kesên 3. pirjimar **Ew** | Hatin | Hatibûn | Dihatin | Hatine |

## Di Hevokên Navdêrî de Dem

**Di saloxan de dem; dibe sê beş**

a-dema borî

b-Dema Niha

c-Dema bê

a-Dema borî; tenê boriyê veger bingeh tê girtin.

**Mînak:**

Gulistan ciwan bû.

b-Dema Niha; pêveka “e, ye, in” digire.

**Mînak:**

Gulîzar ciwan e.

Nermîn mamosta ye.

c-Dema bê; weke dikeve li ser karê pêveka “yê – wê” dikeve li ser saloxê jî û dema bê dide diyar kirin.

**Mînak:**

Sosin wê zana be.

# BEŞA 5.

## DESTÛRÊN NIVÎSÎN Û HÊMADANÎNÊ

### A-Destûrên Nivîsînê

Zimanek bi hinek destûrên diyar derbazî nivîsînê dibe. Ger di nivîsînê de yekîtiya nivîsînê çênebe bi demê re çêbûn û rêxistina wî xirab dibe, destûrên wî serûbin dibin. Ji bo pêşîgirtina vê riya bi tenê fêrbûna destûrên ziman yên ku yekîtiya ziman diparêze.

**DAXUYANÎ**

Di zimanê Kurdî de, Kurdiya kevin, bi awayek xwezayî bingeh tê girtin. Ji bo her dengekî tîpek tê nivîsîn. Li jêr destûrên ku nivîsînê bi rêxistin dikin, hatine vekirin.

**1- Nivîsandina peyvên pirsyarî**

Peyvên pirsyarî bi awayekî gîştî cûda têen nivîsandin. Lê li ser karanîna hevokê bandorek mezin çêdikin. Dema ev peyv di hevokê de tên bikaranîn giraniyek mezin didin hevokê yanî hevok bi giraniyek bilintir tê xwendin.

**Mînak :**

Ma hatin?
Kê xwar?
Kî hat?
Kîjan name?

## 2- Nivîsandina alavên gihanek (peywend)

Peyvên gihanek her tim cuda tên nivîsandin. Karê wê di hevokê de girêdana dû peyvan yan jî dû hevokan bi hev re çêdikin.

Pênûsên ku hevalan ji me re anîn, ciwan in.

Hinek diçin bajar lê hinek naçin.

Hem zana hem pêşketiye.

## 3- Nivîsandina daçekan

Alavên daçekî; hem daçek hem jî paşdaçek her tim cuda tên nivîsandin. bi peyvan ve nazeliqin. Dikevin ser navan û rewşek daçekî ji navan re didin peydakirin.

Di daristanê de lawirên cûr be cûr hene.

Em bi hevalan re çûn.

Azad ji wê ve tê.

Ew li cîhanê geriya.

## 4- Karanîna tîpên mezin

**a) Hevok bi tîpa mezin tê destpêkirin**.

-Gotinên pêşiyan;rûmetên netewî ne.

-Kurdistan welatek pir dewlemend e.

**b**) Piştî cotxalê hevok bi tîpên mezin tên destpêkirin.

-Rêzan got: “Divê em biçin dibistanê”

-Serhat got: “Xwendekar dê biçin geştê”.

**c) Hevokên dikevin piştî hêmaya pirsê, bi tîpa mezin tên destpêkirin**.

-Ma ji azadiyê xweştir çi heye? Xweşiya azadiyê têbigihînin.

**d) Hevokên dikevin piştî baneşan bi tîpa mezin tên destpêkirin.**

-Hevalno! Erkên me yên destpêkê fêrbûna zimanê xwe ye.

**e) Rêzik bi tîpa mezin dest pê dike**.

Ez naçim dîwana mîran,
Nabim şalûlê koçk û seran.
Bila li min xin kêr û xenceran.
Feqiyê Teyran tengezarê dilan.

**ê) Navên taybet û paşnavên wan bi tîpa mezin destpêdikin.**

-Mahmut Baksî
-Şêrgo Bêkes
-Aram Tîgran
-Îsa Hiso

**f) Peyvên rêzgirtinê yên dikevin beriya nav yan piştî nav, nasnav, pîşe bi tîpên mezin destpêdikin**.

-Şehîd Arîn
-Birêz Zîlan.
-Bedirxan Beg
-Mamoste Viyan.
-Sebrî Botanî

**h)Nasnav bi tîpên mezin tên destpêkirin.**

- Kawa ( Mazlum Doxan)
-Zîlan ( Zeynep Kinaci)
-Viyan ( Çîçek Demîr)

**I) Navên ku xizmaniyê didin diyarkirin, dema li pêşiya navê kesî bê, bi tîpa mezin dest pê dike.**

-Xal Egîd
-Mam Reşo
-Met Xemê.

**Î) Navê gel, welat, ziman û zaravan bi tîpên mezin dest pê dike.**

-Kurd
-Îran
-Kurdî, Elmanî
-Kurmancî, Zazakî

**k) Navên olan, nav û hevalnavên bi wan ve girêdayî bi tîpên mezin dest pê dikin.**

Îslam
Elawî
Şafîi
Êzîdî

**l) Navên saziyên fermî bi tîpên mezin tên destpêkirin.**

Enstûtiya Kurdî

Weşanên Roj

Weşanên Doz

**m) Navên pirtûk, kovar, rojname, zagon, rêvebirtî bi tîpa mezin dest pê dike**.

Mem û Zîn

Hewar

Dîwana Melayê Cîzîrî

Wêjeya Zimanê Kurdî

**n) Navên stêrk û pêgeran bi tîpên mezin tên destpêkirin.**

Cîhan

Roj

Heyv

Venûs

Merkur

Gelavêj

**p) Navên roj û mehên ku dîrokekê didin diyarkirin bi tîpên mezin tên dest pê kirin**.

27' ê Mijdara 1978'an partiya Karkerên Kurdistan hatiye damezirandin.

Meha Îlûn dibistanên me vedibin.

**r) Navên welat, herêm, bajar, navçe, gund, tax, rê, şeqam, av û çiyan bi tîpên mezin tên dest pê kirin.**

**Navên Parzemînan**

Asya,

Ewrûpa

**Navên welatan**

Kurdistan

Gurcistan

Ermenîstan

**Navên herêman**

Rojhilata Navîn
Bakurê Rojava
Hewreman
Behdinan
Cizîr  (Rojava)

**Navên bajaran**

colemêrg
Mehabad
Silêmanî
Qamîşlo

**Navên navçeyan**

Nûrşîn
Şarezor
Cizîr

**Navên gundan:**

Mijîn
Şeran
Fîs
Hesena
Girsor

**Navên taxan**

Taxa Cudî
Taxa Berberoj
Taxa Enterî

**Navên şeqaman**

Şeqama Musa Anter
Şeqama Musêbîn.

**Navên robaran**

Robarê Dîcle
Robarê Firat

Robarê Hîzil
Robarê Munzur

### Navên çiyan

Çiyayê Gare
Çiyayê Qendîl
Çiyayê Cîlo
Çiyayê Şaho

### 5 - Nivîsandina peyvên hevgirtî

Ew gotinên ku ji hevgirtina çend peyvan pêktên û bi hevdu ve dizeliqin, jê re **peyvên hevgirtî** tên gotin. Di zimanê Kurdî de peyvên hevgirtî her tim bi hev ve tên nivîsandin.

Cigerxwîn
Çavreş
Sorgul
Gamasî
Karxezal

### 6- Di zimanê Kurdî de nivîsandina peyvên biyanî

a) Peyvên biyanî, em di jiyana rojane de, gotûbêj dikin çawa tê peyvîn wisan tê nivisandin.

Farisî
saet

### 7- Nivîsandina Navên Taybet

- Navên mirovan ji ber ku heyînekê tenê didin diyarkirin taybet in. Ji ber vê çendê her tim bi tîpa mezin dest pê dike.

Gulistan
Mêrxaz
Nêrgiz
Şoreş

## LÊKOLÎN

**1**-Nivîsandina navên herêm, bajar, gund û taxan çawa çêdibin? Lêkolîn bikin

**2**-Di zimanê Kurdî de daçek çawa tên nivîsandin? Lêkolîn bikin.

## 2-HÊMADANÎN

Ji bo cih û wateya peyvan, di nivîsandinê de bên diyarkirin, hinek hêma tên bikaranîn. Xal, bêhnok, cotxal, baneşan, hêmaya pirsê û h.w.d. Ji van re **hêmayên (xalbendî) nivîsînê** tên gotin.

### 1-Xal (.)

**a)** Dikeve dawiya hevokê.

Aras ji Amudê hat.

**b)** Di rêzkirina jimarê de tê bikaranîn.

"0.1. 2. 3.8.12.24…. h.w.d"

**c)** Li dawiya kurtkirinan tê bikaranîn.

Dr.(doxtor) N:Ç.M.( Navenda Çanda Mezopotamya) P.K.K (Partiya Karkerên Kurdistan)

**ç)** Dema em dîrokê dinivîsin, di navbera dîroka roj, meh û salê de tê bikaranîn.

21.03.2000

**d)** Di navbera demjimêr û hûrdeyê de tê bikaranîn.

$13.^{\underline{30}}$

**e)**Di bîrkarî de li cihê hêmaya hevdanê tê bikaranîn.

5.20=100 40.10= 400

## Bêhnok (,)

a) Di hevokên dirêj û dema kirek ji kar dûr bikeve, tê bikaranîn.

Bilindê Mêrxaz, pir lez diçe dibistanê.

b) Di hevokê de di navbera peyv û birepeyvên di heman erkî de tê bikaranîn.

Egîd, Şervan, Hozan û Berçem şoreşger bûn.

c) Ji bo rêze hevokan ji hev cuda bike, tê bikaranîn.

Roj diçe ava, kew dixwînin, gêrila ji cihê xwe derdikevin û dest bi şer dikin .

ç) Peyvên weke "erê, na, baş e, dibe, serçavan " yên ku girêdayî hevokên li pey xwe re tên li pişt wan peyvan bêhnok tê bikaranîn.

Na, ev rewş bi vî awayî berdewam nake.

Erê, em ê biçin çiyê.

## Xal Bêhnok

1- Di rêzehevokan de, di hevokên awênê wan cuda lê di warê bi hev ve girêdayî de, ji bo cudakirina hevokên serbixwe tên bikaranîn.

**Mînak**:

Divê em ji Rêber hes bikin; divê di riya wî de biçin lê divê em rûmeta wî bizanin.

2. Ji bo endamên ziman yên bi bêhnokan ji hev hatin cudakirin wekî gruban cudakirin tê bikaranîn.

**Mînak:**

Îşev ez hizirîm ku ji bo jiyanek demê xwe temamkirî, nedûrî nenêzîkahî; nezehmetî, nehêsanî, neqehir, nehîskirin heye.

## Cotxal

**Cotxal hêmaya daxuyaniyê ye.**

1-Dema di derbarê darezanekê de daxuyanî bêdayîn, tê bikaranîn.

**Mînak:**

Gulê got:

Di xewnên penaberekê de vegera welat , di xiyalên bindestekî de azadî heye. Dil li benda bexşandinek giştî ye.

2. Li pêşiya mînakên di derbarê mijarekê de bêdayîn, tên danîn.

**Mînak:**

Kiteyên dengkurt: Ji, ne, tu...

## Sêxal

1. Li dawiya hevokên temam nebûyîn tê bikaranîn.

**Mînak:**

"Îro netixûb mane, neleşkertî û neşer..."

Ev xwendin û perwerde bi mirov çi nade têgihandin...

2. Li cihê gotinên nayên xwestin bêgotin, tên bikaranîn.

**Mînak:**

Ji min re... got.

## Hêmaya Pirsê

1. Hêmaya pirsê li dawiya hevokên pirsyarî tên bikaranîn.

**Mînak:**

Gelo ji serxwebûnê xweştir çi heye?

2- Dû hevokên pirsyarî yên li pey hev tên, li dawiya wan tê bikaranîn.

**Mînak:**

Ev mirov çima li vir in, çi dixwazin, li çi digerin?

## Baneşan

1- Li pişt peyv û hevokên xurûş û sersormanê didin diyarkirin tê danîn.

**Mînak:**

Hey sanşa xirab! Ji mirinê nexweştir e, ev koçberî!

2- Piştî bangên hezkirin û tirsê diyar dikin tê danîn.

**Mînak:**

Ax! Çi welatekî xweş, mîna bihûştê ye.

Hewar e...! Agir bi malê ket.

### Xêzika Axaftinê

1-Ji bo diyarkirina axaftinê tê bikaranîn.

2- Xîzika axaftinê di goftûguyan de ji tê bikaranîn.

**Mînak:**

-Em di rewşekî aloz de ne...

-Êdî zehmetiyên me jî zêde dibin.

-Jixwe ev germahî mirovan ji gelek tiştan sar dike.

Hozan got:

- Tûyê bi kû ve herî?

Dilşêr :

- Ezê biçim Agirî.

### Xêzika navber

1-Di parvebûna peyvên di rêzikekî de bicih nebûyîn dema peyv neçar be ku ji hev qut bibe, li cihê hatî qutkirin tê bikaranîn.

**Mînak:**

Rêber APO ji bo azadiya hemû mirovên cîhanê têkoşî-
nê dike.

2-Di xebatên rêziman de ji bo girêdana kok û paşgir bide nîşakirin yan jî peyvekê bikiteyan bide dabeşkirin tê danîn.

**Mînak:**

A-xîn , cot - yar, he - val - bend, şa - re-za.

### Xêzika Xwar

1-Rêzikên helbestan yên ku tê xwestin li bin hev bên nivîsandin, dema pêdivî hat dîtin li rex hev bêndanîn, di navbera wan de tê bikaranîn.

**Mînak:**

Dema dinê dibe bihar / Dipişkivin devî û dar

2-Di navbera dîrokan de û di navnîşanan de tê bikaranîn.

**Mînak:**

07/05/2002

Çîya serbest
Kolana azadî hêjmar :72/ 24
Heskîf / ÊLIH

## Neynok (Dûnik)

1-Peyv û nivîsînên ji kesekê yan jî ji çavkaniyekê hatîn girtin û di nava nivîsînekî de hatî bicihkirin, di nava neynokê de tê danîn.

**Mînak:**

Rêber APO li ser xwendinê wiha dibêje; "Xwendin ronahiya jiyanê ye."

2-Di nivîsînê de ji bo balkişandina li ser peyvekê jî hêmaya neynok tê bikaranîn.

**Mînak:**

Di tevayî perwerdeya ramyarî de, “Rêbaza Rêber Apo” bingeh tê girtin.

## Kevanok

1- Di daxuyaniyên ku bi çêbûna hevokê ve negirêdayî de tê bikaranîn.

**Mînak:**

Rûstem Cûdî ( Rûstem Osman) sala 2010'ê şehîd ket.

2- Di berhemên şanoyan de agahdariyê di derbarê kes yan jî dekorê de tên dayîn, dikevin nava kevanokê.

**Mînak:**

Heval: ( Bi lêvken) Banî hevalan kir.

## LÊKOLÎN

1- Hêmayên nivîsînê ji bo çi tên bikaranîn? Lêkolîn bikin.
2- Cihên ku xal lê tê bikaranîn diyar bikin.
3- Cihê bêhnok tê bikaranîn diyar bikin.
4- Cihê nîşana pirsê tê bikaranîn diyar bikin.
5- Cihê baneşan tê bikaranîn diyar bikin.
6- Cihê cotxal tê bikaranîn diyar bikin.
7- Cihê xal bêhnok tê bikaranîn diyar bikin.
8- Cihê kevanok tê bikaranîn diyar bikin.
9- Cihê xêzika axaftinê tê bikaranîn diyar bikin.
10- Cihê sêxal tê bikaranîn diyar bikin.
11- Cihê neynok (donik) tê bikaranîn diyar bikin.
12- Cihê xêzika xwar tê bikaranîn diyar bikin.
13- Cihê xêzika navber tê bikaranîn diyar bikin.


Derya Res
Gurcistan
Rusya
Ermenistan
Azerbeycan
Tirkiye
KURDISTAN
Nahcevan
Iran
Derya Sipi
Suriye
Lubnan
Iraq
Idir
Qers
Sewas
Erzincan
Erzerom
Bazid
Agri
Mako
Caldiran
Dersim
Cewlik
Eleziz
Mus
Tetwan
Wan
Qotur
Xoy
Elbistan
Meleti
Farqin
Bitlis
Firat
Semsur
AMED
Batman
Sert
Basqale
Gever
Meras
Besni
Siverek
Merdin
Sirnex
Clemerg
Zaxo
Urmiye
Entap
Riha
Veransehir
Nisebin
Cizir
Nexede
Qamislo
Dicle
Dihok
Mihabad
Iskenderun
Hasakeh
Musil
Hewler
Bokan
Seqiz
Bicar
Kerkuk
Silemani
Merivan
Sine
Helebce
Qesri-Sirin
Kirmansah
Xaniqen
Ilam